

# nûbihar

Mehnameya Çand û Huner û Edebiyat

Hejmar: 8

Sal: 1

Gulan 1993

Biha: 10.000 TL

Dar li ser kokê xwe  
hêşîn dibin,  
mirov li ser zimanê xwe!





**Xwedî**

(Sahibi)

**MAHMUT YARLUĞ**

**Berpirsiyarê Giştî**

(Genel Yayın Yönetmeni)

**SABAH KARA**

**Berpirsiyarê Nivîsaran**

(Sorumlu Yazışleri Müdürü)

**SÜLEYMAN ÇEVİK**

**Mudîrê Tîprêzî û Arşivê**

(Dizgi ve Arşiv Müdürü)

**ALİ KARADENİZ**

**Muşawîrê Nivîsaran**

(Yayın Danışmanı)

**MUSTAFA GOYANI**

*nûbihar* kovareke mehanî ye ku bi weşandina karpêkên çanda Kurdî bi mana tevayî dilebibe. Raman û rayên xwediyên karpêkan, lîzûmen ne raman û rayên *nûbihar* in. Nivîsaranê ku bi îmzeya Berpirsiyarê Giştî weya bi navê *nûbihar* tîn weşandin raman û raya *nûbihar* nîşan didin. *nûbihar* di serrastkirina karpêkên şandî de azad e.

**Bedela abonetiya salinî:**

**Li hundir: 120.000 TL**

**Li derve: 50 DM**

**Jimareyên hesabê:**

**Li hundir: Postgiro (Posta Çeki): Süleyman Çevik, 658265**

**Li derve: Süleyman Çevik, İş Bankası Yavuzselim Şubesi, 1079-30100-3118770**

**Navnîşan (Adres):**

Kızıtaşı Cad. Kurş Apt.

No: 51/3 Fatih - İstanbul

**Tel/Faks:**

524 00 38 - 533 75 88

**Tîprêzî (Dizgi):**

*nûbihar*

**Berg (Kapak):**

**Dönüş**

**Çapxane (Matbaa):**

**Mutlu Ofset**

# *nûbihar*

Mehnameya Çand û Huner û Edebiyat

## **DESTPÊK**

- Îlel ebed bijî ey zimanê şêrîn; îlel ebed bijî! .....3

*nûbihar*

## **NÛÇE**

- Nûbihar di cihê xwe yê nuh de .....4

## **SERNIVÎSAR**

- Dar li ser kokê xwe hêşîn dibin, mirov li ser zimanê xwe! .....5

**SABAH KARA**

## **BERG**

- Roj, roja zanebûn û hînbûna bi zimanê xwe ye .....7

**SÜLEYMAN ÇEVİK**

- Zimanê bêxwedî .....10

**XWEDÊPEREST**

- Ma Îslam zimanê Kurdî bîpaşde xist? .....11

**ÎBRAHÎM XELÎL MOLAZADE**

- Di hêla dîrok, çand, edebiyat û zimanê Kurdî de xebatên hêja .....13

**LOKMAN POLAT**

- Ziman mohra qederê ye .....16

**NACI GÜLMEZ**

## **HELBEST**

- Seidan re .....9

**XELÎL AMED**

- Rewşa me .....12

**ABDULLAH AYDIN**

- Nuqurç .....12

**MELA QASIM**

- Nameyên bêcewab / 8 .....18

**SABAH KARA**

## **BANÛNAME**

- Hz. Hewwa û gerdûn .....28

**MİHRİCAN DOĞAN**

## **PIRSA KURDÎ**

- Helkirina pîrsgirêka Kurdan .....19

**DR. OMER KEMAL**

- Ya rast, agir dora xwe dişewitîne .....22

**METİN ÖNAL MENGÜŞOĞLU**

## **ZAZAKÎ**

- Dimilî biwan Dimilî binûs .....25

**M. SAID AVCI**

- Ti zey ma nêbenê ma ya meyi .....26

**M. KEMALİDİN BEŞİRAN**

- No kancîn dewr o .....26

**WEDAT Ê BEDİRXANÎ**

## **ZAROKNAME**

- Pûtên bêxêr û bêkêr .....27

**XELÎL AMED**

## **NAMEYÊN WE**

## **FERHENGOK**

## **RÊZEPIRS**

**ELİ KEÇELİ**

# ALFABEYÊN LATÎNÎ Û EREBÎ YÊN KURDÎ

LATÎNÎ	MÎNAK	EREBÎ	MÎNAK
A a	Agir	ا	ئاگر
B b	Bav	ب	باڤ
C c	Cil	ج	جل
Ç ç	Çay	چ	چای
D d	Dê	د	دی
E e	Evîn	ه	ئه‌ڤین
Ê ê	Êzing	ی	ئه‌یزنگ
F f	Ferat	ف	ڤه‌رات
G g	Genim	گ	گه‌نم
H h	Hêlîn	ه	هه‌یلین
Î î	Îstêrk	-	ئسته‌یرک
Î î	Îlon	ی	ئیلون
J j	Jîn	ژ	ژین
K k	Kal	ک	کال
L l	Lorîn	ل	لورین
M m	Masî	م	ماسی
N n	Nimêj	ن	نمیه‌ژ
O o	Ol	و	ئول
P p	Pîr	پ	پیر
Q q	Qelem	ق	قه‌لهم
R r	Reng	ر	ره‌نگ
S s	Ser	س	سەر
Ş ş	Şîr	ش	شیر
T t	Tolik	ت	تولک
U u	Umêd	و	ئومیه‌د
Û û	Ûr	وو	ئوور
V v	Vala	ڤ	ڤالا
W w	Welat	و	وه‌لات
X x	Xebat	خ	خه‌بات
Y y	Yek	ی	یه‌ک
Z z	Zelal	ز	زه‌لال

# ÎLEL EBED BIJÎ EY ZIMANÊ ŞÊRÎN; ÎLEL EBED BIJÎ!

Sernûçe, yanê manşeta vê hejmara me, "Dar li ser kokê xwe hêşîn dibin, mirov li ser zimanê xwe!" ye.

Me xwest ku em di vê hejmarê de li ser zimên û girîngiya zimên bisekinin û lizûma axaftin û xwendin û nivîsandin a bi zimanê xwe, nîşan bidin.

Her çi ev pirs bi qasî ku kitêbin li ser bêtin nivîsandin mufessel û dîvdirêj be jî, me xwest ku em ji aliyekî lê binihêrin û dîqata xwendevanê hêja yî xwe bikşînin bal vê pirs girîng û heyatî; ji bona ku her kes zorê bide xwe û bi zimanê xwe bi axîfe û bixwîne û binvîse; zimanê xwe bi zarokên xwe hîn bide û tim î tim li ser vê pirsê jî bisekine.

\*\*\*

Hevalno!

Zimanê me şêrîn e.

Zimanê me hêja ye.

Zimanê me delal e.

Ev zimanê hêja li benda me ye ku em pê kitêbên ilmî binvîsin, em pê kitêbên edebî û hunerî binvîsin, em pê dilşa bibin û pê şîne bikşînin.

\*\*\*

Miletê bêziman, ne ti millet in; hetta ne millet in jî!

Xusûsiyetek ji xusûsiyetên ku mirovan dike gel, yanê dike millet; ziman e.

Naxwe li zimanê xwe xwedî derkevin.

Ko zimanê merev ne ti ziman be jî, ge-

reke merev dev ji zimanê xwe bernede. Lêbelê zimanê me, zimanek ji zimanê dereca ewil e.

Naxwe pîr heyf û xebînet e ku em dev ji vî zimanî biqerin.

\*\*\*

Hevalno!

Me çavê xwe bi lorîna diya xwe yî bi vî zimanê şêrîn vekir.

Naxwe bila li ser zarokê me jî bi vî zimanî bête lorînkirin.

Hevalno!

Dijmin her tiştê me ji destê me girtin. Tiştê ku henûz nekarîne ji me bistênin, zimanê me ye. Nekin ku ev jî ji destê me here!

\*\*\*

Zimanê xwe hîn bibin. Bi zimanê xwe hîn bibin, bi axîfin, bixwînin û binvîsin.


Bi zimanê xwe; evîna xwe, huzna xwe û derd û kulê xwe bînin zimên. Hun ê bibînin ku zimanê we bi tenê, wê bikaribe van tiştan îfade bike. Lewra kokê vî zimanî di mêjî û rihê we de ne.

Naxwe iznê bidinê ku ev dara tûba hêşîn bibe û we bi fêkiyê delal î xwe têr û dewlemend bike.

\*\*\*

Îlel ebed bijî ey zimanê şêrîn;

Îlel ebed bijî!



nûbihar

# NÛBIHAR DI CIHÊ XWE YÊ NUH DE

**B**i munasebeta cih guhertina kovara me Nûbihar, bi tarîxa 17 Nîsan 1993 de di navenda me ya nuh de merasi-mek tertîb bû.

Di vê merasima ku gellek xwendevan û nivîskar û elaqemendên kovara me, mumessilên weşanxane û navendên Kurdî û Tirkî hatin cem hevûdu, Berpirsiyarê Giştî yê me Sabah Kara axafti-nekê kir.

Sabah Kara di vê axaftina xwe de li ser zimanê Kurdî û weşandina kovar û kitêbên Kurdî sekinî; di heqê girîngiya van cûr xebatan de û ji bona bi pêş de birina fealiyetên çandî û ilmî de raman û pêşniyarên xwe anî zimên.

Piştî axaftina Berpirsiyarê Giştî yê me, mêvanê me jî raman û pêşniyarên xwe got in û berpirsiyarên kovara me, ji bona van xebatan tebrîk kirin.



Berpirsiyarê Giştî yê me (bi cilê Kurdî)  
bi hinek ji heval û mêvanan re



Mêvanên me

# DAR LI SER KOKÊ XWE HÊŞÎN DIBIN, MIROV LI SER ZIMANÊ XWE!

Sabah Kara

**E**rê; çawa ku dar bêkok nabin û li ser kokê xwe hêşîn dibin, milet jî nikarin bê ziman bin û ew jî li ser zimanê xwe şîn tên. Loma tarîxa medeniyetan, ji cîhetekê tarîxa zimana ye. Lewra medeniyet li ser ziman û karpêkên zimanî, weke kîtabe û kitêb û kovaran bilind dibe û di dîrokê de bê zimanêke bipêşdeçûyî, ti medeniyet pêk nehatiye.

Naxwe bê şik, bipêşdeçûna Kurdan jî bi zimanê wan ve bi şida girêdayî ye û heta zimanêke qewî pêk neye, medeniyeteke qewî jî pêk naye û Kurd jî vê perîşaniyê xilas nabin.

Çima?

Lewra meriv bi ziman "difikire". Her çi beriya ziman, qeweta fikrê bi şiklê "bilquwwe" di nefsa meriv de mewcûd be jî, pêkhatin û derhatina fikr, bi sayeta ziman e. Naxwe em karin bibêjin ku zimanê meriv çiqas qewî û çiqas "efradê xwe camî û exyarê xwe manî" be, fikra meriv jî ewqas qewî, muşexxes û efradê xwe camî û exyarê xwe manî dibe; yanê tiştê ku gereke derber bigre, digre û tiştê ku gereke li derve bihêle, li derve dihêle; yanê net û xalis dibe.

"Mana" bi sayeta ziman tete wucûdê. "Çibûn" û "çawabûn" a her tiştî bi sayeta

ziman tete famkirin û îdrak dibe û cardin bi sayeta ziman tete famdan û îdrakdan.

Ziman ji cîheta nijadî, irsî, enanetî û tarîxî jî pîr muhîm e. Nijad, berî her tiştî ji cîheta ziman jî hevûdu cûda dibin. Lewra xusûsiyeta eslî ya her nijadî, zimanê wî nijadî ye.

Çima?

Lewra ziman, di mējiyê her şexsî de weke dewş, şop û rêçê ye û ev dewş, şop û rêç, wî şexsî bi hevnijadiyên wî ye berê û yê îroyîn ve girêdide; enane û adetên berê zêdetir bi sayeta ziman, mewcûdiyeta xwe didomînin.

Dibe bête gotin ku, ferqa di nav însanan û civakên muxtelif û

çandên muxtelif de, ji vê cîhetê ferqa zimanên wan e. Yanê jihevçûdabûna zimanan, insan û civak û çandan ji hevûdu cûda dike.

Ko em bi kurtahî bibêjin insan him ferdên û him jî bi şiklê komelayetî, civakî û hozayetî, xwe bi sayeta zimanê xwe îfade dike û hetta dibe bête gotin ku, çawa insan berî her tiştî bi sayeta zimanê xwe insan e, civak û komele jî bi sayeta zimanê pêk hatine. Lewra merivê ko nikaribe bi kesî re bipeyive, nikare gelemperî bibe û civak û komeleyan pêk bîne. Lêbelê li vir, diyalektîkeke pîr calib mewcûd e:





Weke ku ziman meriv dike însan û wî gelemperî dike û civakan pêk tîne, eynen wisa jî însan û gelemperîtî û komelayetî jî ziman pêk tînin. Yanê ziman him netîce û dawîtî ye û him jî sebeb û sedem e.

Ko em vê bi şiklê paradoksekê bibêjin:

Ziman him diya diya xwe ye û him zarokê diya xwe!

Yanê çi?

Yanê ti mîlet nikare mîletbûn û komelayetiya xwe bêyî ziman pêk bîne û ziman jî bi sayeta komelayetî û danûstandinên însanan bipêşde diçe.

Çima?

Lewra bi mana xwe ya antropolojîk û mirovnaşî, “çand”, yanê kultur, her aliyê jiyana meriv derber xwe digre, îhata dike; û “ziman” û “çand” heger ne yek bin jî, derber hev in; yanê di nav hevûdu de ne û hevûdu îhate dikin.

Yanê çi?

Yanê em karin bibejin ku: “Ziman” û “çand”, nod ji sedî (90 %) “yek” in.

Ez zanim ku wê hinin ji we îtiraz bikin. Meselen wê bibêjin ku “Gellek unsurên çandê henin ku ti elaqeya wan bi ziman re tineye; mîna wêne, yan sen’etên destî û ziraet û hwd.”

Lêbelê gereke em jibîr nekin ku meriv van tiştan jî bi sayeta ziman fikiriye û pey-

da kiriye û wan bi sayeta ziman biqîmet dike, disengîne û îdrak dike. Lewra bêyî ziman “fîkr” nîne. Welew em tiştêkî di aqlê xwe de jî bibuhurînin, em wî tiştî bi şiklê kelîmê, yanê bi sayeta ziman, ji aqlê xwe dibuhurînin.

Meselen de kanî “xanî” yan “qelem” yan tiştêkî din ji aqlê xwe bibuhurînin... Ma hûn karin vî karî bêyî ziman pêk binin? Helbet na!

Erê; ziman bi şikle parek ji pareyên çandê bi însanan neqil dibe; lêbelê yê ku çandê neqlî însanan dike jî zaman e.

Yanê weke ku hêk ji mirîşkê ye, mirîşk jî ji hêkê ye.

Naxwe xulase û dawî çiyê?

Dawî eve ku bêyî ziman ti tişt nabe. Însan û civaka ku li zimanê xwe xwedî dernakeve û zimanê xwe bipêşde nabe, di heqîqetê de xwe mesix dike û xwe ji holê radike.

Naxwe Kurdino! Li zimanê xwe xwedî derkevin! Lewra ko hûn li zimanê xwe xwedî dernekevin, hûn ê mesix bibin û ji holê rabin; yan jî hûn ê bibine mexluqateke ecîb xerîb, hûn ê bibine teyreke nîv kevok û nîv qaj û wê îlelebedî him kevok û him jî qaj henekê xwe bi we bikin; û vaye dikin jî. □

# ROJ, ROJA ZANEBÛN Û HÎNBÛNA BI ZIMANÊ XWE YE

Süleyman Çevik

**R**êya zanebûnê bi arîkariya ziman û bi xwendin û hînbûnê vedibe. Ziman tinebe, zanebûn ewqas bi hêsaniyê meydanê. Nezanî jî bi gelemperî, bi arîkariya xwendin û hînbûnê radibe.

Mirov bi ziman; xwe, xelqê xwe û dinyayê nas dike. Bi ziman ve, mirov jî hevûdu fam dikin derd û kulên xwe, kêf û şahiyên xwe jî hevûdu re dibêjin. Bi vî awayî ziman wezîfa xwe ya famkirinê dike.

Ziman aletê zanebûn û ramana ne.

Mirov him xwedî mesûliyet in, him jî, jî pîrr hêlan jî jiyandaran cihê dibin. Ziman jî, jî hêlekê ve mirova jî jiyandaran cihê dike. Heywan yan jî nebat jiyandar in, lêbelê nikarin qise bikin.

Îfadekirina fikran, bi ziman dibe. Mirov û fikr, mîna goşt û hestî bi hev girêdayî ne. Çawa mirov û fikr jî hev cihê nabin, wisa jî di navbera ziman û fikr de yektiyek zexm heye. Lewra mirov fikrên xwe bi zimanê xwe, îfade dike.

Ziman xisûsiyeta xelqekî ye ku, wî xelqî jî xelqên din cuda dike. Tiştê ku xelqekî dike mîlet, ziman û çand û huner û orf û edetên wî ne. Di nav van xisûsiyetan de xisûsiyeta tewr girîng zimanê wî xelqiye. Lewra zimanê ku mirov pê qise dike û dinivîsîne û zimanê ku mirov pê kilam û stranên xwe dibêje, mîletê jî mîletekî din cihê dike û wî mîletî dike mîlet.

Ziman haceteke civakî ye. Ji bo hemû mirova di mer'iyetê de ye. Lewra mirov bi ziman qise dikin û jî hevûdu fam dikin. Zimanên dinayayê jî tev, beramberî hev li hev tesîr dikin û pêş de diçin û bi vî şiklî jî xwe re kelîmeyên nû peyda dikin.

\*\*\*

Kurd jî mêj ve bi zimanê xwe jî xwendin û nivîsandinê mahrûm mane. Zimanê Kurda jî cih ku Cumhûriyeta Tirkî ava bûye vir de, qedexa bûye û nehatiye bikaranîn. Kurd jî zimanê xwe bê xeber mane û zimanê xwe têra xwe nas nekirine. Nizanîne ku zimanê wan çiqas dewlemend e û bi kurdî çawa tê xwendin û çawa tê nivîsandin? Bi kurdî qise kirine, lêbelê jî kurdî bê xeber bûne. Lewra zaliman nehiştine ku Kurd ti cara zimanê xwe nas bikin, pêş de bibin û zimanekî hemdemî bînin holê. Him nehiştine xwendegehên Kurda ava bibin, him jî medresên sedsalan tev girtin.

Zarokên Kurda jî tehsîla ilim mahrûm man. Seydayên zana di nezera dewletê de bi carkî de nezan bûn. Bê dîploma xwendegehên dewletê (Îmam-Xetîb) meletiya wan qebûl nebû. Nehiştin seyda, teleban bîdin xwendin. Xortên jî îmam xetîban mezûn bûn jî pîrrê wan bi ilmê xwe yên nêvî meletî kirin.

Nehiştin Kurd ne bi tîpê Latênî ne jî bi tîpê Erebî zimanê xwe bixwînin û binivîsin. Mecbûrê xwendina zimanê Tirkî bûn. Malûm e ku mirov bi zimanekî biyanî bixwîne, nikare pîrr pêş de here. Ev aqîbet îro hatiye serê Kurdan jî. Kurd tim jî dinyayê û li tiştên nû hêxeber man.

Rejîma dewletê li sebeba ku li medresan îlmên Îslamî dihatin xwendin û li ser zimanê kurdî xebat çêdibûn, medrese jî ji jiyana Kurdan rakir. Encax bi arîkariya xelqê hinek medrese li ser piya man.

\*\*\*

Ev du sal in kovar û rojname û kitêbên



Kurdî derdikevin. Lêbelê li ber wan asten-giyên pirr giran hene. Meselên em ji hêla aborî de li meselê binêrin; kes îlana nadin kovar û rojnamên Kurdî. Xwendevanên wan kêma in, belavkirina wan mahdûd e. Ev tev li ser piştê weşanên Kurdî bar in û derbê giran ji hêla aborî de bi weşanên Kurdî didin...

Em niha kovareke yan jî rojnameke Tirkî biweşînin xwendevanên wê pirr in. Ev kovar, yan jî rojname bi Tirka hemûyan re û bi pirrê Kurda re jî hitab dike. Lewra zimanê Tirkî zimanê dewletê ye, resmî ye û her kes bi Tirkî dizane qise bike û bixwîne. Lê kovareke Kurdî li Tirka tew xîtab nake, ji Kurda re jî encax deh ji sedî re dikare xîtab bike. Yan jî ewqas jî nîne.

Wextê zimanek di nivîsandinê de, di talîmê de û televîzyon û radyoyê de bikar neyê, ew ziman pêş de naçe. Ne pêş de çûyîn, ser de bê guman şûnde jî dimîne. Pirr kelîme jibîr dibin û ji ziman derdikevin.

Îro hinek kes dibêjin zimanê kovara we û zimanê weşanên Kurdî pirr fam nabin. Em heta noqtekî van gotinên wan kesan normal dibînin. Lewra ji bona ku Kurdî ji mêj ve bi tevayî nebûye zimanê nivîsandinê, devokek (şîwe) hevbişkî nehatiye meydanê. Ewqas sale Kurd ji zimanê xwe dûr mane. Xelqê Çolemergê ji xelqê Rihayê, xelqê Rihayê ji xelqê Mûşê dûr mane. Heger sîh yan jî çel sal berê rojname û kovar yan jî radyo û televîzyon û xwedeghehên Kurda hebûna, wê kurmanciya me hê nêziktirî hev bûna û ev

pirsiyara li ber me jî, nedihat holê.

Yek ev e. Ji aliyekî din de kesên ku dibêjin em ji zimanê nivîsandinê fam nakin, bila me biborînin, lê bi baweriya min teralîyê dikin. Ma kî ji wan kesan çawa çûn xwendegeha pêşin, di du sê rojan de, bi Tirkî xwendin û nivîsandin? Kesekî wilo bi baweriya min nebûye û nabe jî. Zarokek wextê sinifa pêşin diqedîne û xwendin û nivîsandinê hîn dibe, em wî kesî pesn û meth dikin. Heger hinek heval dixwazin ku çawa kovarê bi destê xwe kin û di gavê de bi hêsanî bikaribin bixwînin, ev çênabe. Lazime hinek bişuxilin, di vê meselê de cehd û xebatê nîşan bibin û serê xwe bêşînin. Bi ewqas hêsanî ma mirov kîjan zimanî dikare hîn bibe?

Çend sal berê nivîskarê rojname Millî Gazete, M. Şevket Eygi ji min re gotibû: "Berî niha bi çel-pencî salî li Tirkiyê çiqas bajar hene ewqas jî cure Tirkî hebûn. Çi wext, bi Tirkî rojname û radyo û televîzyon derketin, li xwendegehên dest bi talîmê bû, wê wextê her kes hat ser Tirkiya Stenbolê. Îro herkes êdî ji Tirkiya Stenbolê fam dike."

Piştî vê gotinê ez fikirîm. Ev waziyeta ha ji Kurdî re çima ne mumkin be? Çel-pencî sal berê ev îmkananan biketina destê Kurda, îro hinek problem di navbera Kurda de wê nebûna. Di wextê de ev problemên wisa di navbera Tirka de jî hebûne. Piştî hefte sale, ku îxtîlafên di Tirkî de ne, bi tevayî hîna çareser nebûne û hîna jî Tirkî re

sistemeke bi tevayî nehatiye danîn.

Kurmanc ji Dimiliyan bêhtir ji hev fam dikin. Li gor baweriya min, sebaba vê bi Kurmancî ji Dimilî bêhtir hatiye nivîsandin. Ya din jî tesîra qasetên Kurmancî di vir de pirr e. Ev sîh-çel sal e pirr mahdûd be jî Kurd qasetên Kurmancî û radyoyên Yerîwanê û Bexdayê guhdarî dikin. Mirovek devereke din qasetên Mehemed Arifê Cizîrê guhdarî dike û ji Kurmanciya Cizîrê weberdar dibe. Lêbelê di nav Dimiliyan ji bo ku kultura kilama û qasetan rûnenîştiye, ji hev kêmtir fam dikin. Mesela ji Dimiliya Siwerekê Dimiliyên Dêrsimê yan jî Çapaxçûrê pirr fam nakin. Ev jî, ji bê îrtibatîyê tê meydane. Li vir ji hevalên Dimilî re wazîfe dikeve ku li ser zaravê Dimilî bişuxulin û van îxtîlafan ji nav xwe rakin.

Roj li ber me rohnî bûye û roj roja di rêya rast de meşandina ber bi zanebûn û hînbûnê ye. Lazime em li ser zimanê xwe bixebitin û bifikirin û edebiyat û çandeke Îslamî di zimanê xwe de bînin holê. Wî wextî em ê meşa xwe jî bi serfiraziyê biqedînin.

Bingeha ku Celadet Bedirxan û Xelîlê Xeyalî ji me re danîne, lazime em pêş de bibin. Seyda Bediuzeman Seîdê Norsî xebatên Xelîlê Xeyalî yê ku li ser zimanê Kurdî teqdîr dike. Û ji şagirdên xwe yê Kurd re jî şîretên meşîna ser şopa wî dike. Seîdê Norsî dixwaze ku bingeha ku Xelîlê Xeyalî daniye, xortên Kurd pêş de bibin û Kurdî bikin zimanê edebiyatê. □

ŞEHADETİNİN 68. YILINDA

VE ALİM VE MÜCAHİD VE ŞEHİD

ŞEYH SAİD

KİTABI ÇIKTI!  
(Haziranda)

SENA

O bize, hepimize şunu öğretti: Allah'ın dininin ve ilahi adaletin hakimiyeti için hayatınızın en aziz semerelerini, kendi azizlerinizi Allah için feda ediniz ve bundan dolayı bayram yapınız.

# SEÎDAN RE

Du gul vekir li Kurdistan  
Yek li Amed yek li Hîzan  
Şoreşvan û têkoşer bûn  
Yek bi pênûs yek bi çekan

Wek şêran derketin holê  
Deng û bang dan hawîrdorê  
Gotin "Ey koma misliman!  
Serî hildin li ber zorê"

Pirr xebitîn bi roj û şev  
Têr ne dîtî xwarin û xew  
Bo şervanên rêka Xwedê  
Nimûne bûn bi şol û dev

Ti war nehişt digeriyan  
Geh li deştan geh li zozan  
Dixwestin ku hişyar bikin  
Hemû gelên kon û gundan

Ew her du mêrxasên çeleng  
Jîn borandin bi şer û ceng  
Bi lez û bez her dem şixulîn  
Kafir xistin nav tahl û teng

Kefenên xwe li xwe kirin  
Jiyana xwe ruşwet birin  
Li qonaxa Kemo qîryan  
Lerzandin bi tirs û mirin

Herçiqaş yek xeniqandin  
Yê din ji nav gel neqandin  
Neyar bi me kêfxweş kirin  
Lê "Seîdan" wê her hebin

Xelîl Amed

# ZIMANÊ BÊXWEDÎ

## Xwedêperest

**Z**iman! Zimanê Kurdî! Ez ê bi te re axaftinekî bikim. Bawer dikim ku ez ê bi vî awayî hinek dilê te xweş bikim.

Belê, ziman! Me qedr û qîmeta te nizanibû. Me te firot bi zimanê biyanî. Me te jibîr kir. Yan, te bi me dan jibîrkin. Serencam, tu ji me dûr buyî û em jî, ji te.

Pirsgirêka mezin û giring ew dem çêbû. Lewra me te jibîr kir; lê em zimanê din jî hîn nebûn. Em li holê, bêdev û bêziman man. Em bê çand û bê huner man. Em li gerdûn sêwî man. Di nav netewayan de em nezan man. Piştî nezaniyê, warê me ji me standin; me xizan hişt in. Qey bi viya jî qaîl bûn?! Na!.. Paşî, me bihev dan kuştî.ê.

Lêbelê em zanin ku vana tev cezayê gunehên me ne.

Belê, ziman! Ko me te jibîr nekira, qedr û qîmeta te zanibiya, me yê dîroka xwe zaniba. Di wê dirokê de me yê medeniyeta bav û bapîrê xwe zaniba. Me yê şîret û perdên ronakbîr û rewşenbîr û civaknas û mezinê xwe zaniba.

Ko em li gor şîreta wan bimeşiyana, em ê di vê rewşê de nebûna. Lêbelê gava ku me pişt da te, me pişt dabû bav û bapîrê xwe û çand û hunera xwe jî. Me wan piçûk dit û em li pey gotinên dijmin ketin. Vaye rewşa me û rezaletiya me!

Zimano! Zimanê me! Zimanê hêja! Zimanê xweş! Zimanê Kurdî!

Vaye em şiyar bûn. Em ê li te xwedî derkevin. Tu jî li me xwedî derkeve.

Pêşî em zanin tu jî weke her zimanî, ayeta Xwedê yî. Lewra Xwedê di Qur'an a Kerîm de dibêje: "Cûrecûrbûna reng û zimanan, jî ayatên me ne." Ji bo vê ayetê em êdî te pîroz dizanin û wek canê xwe em ê te biparêzin.

Wek Bedûzeman dibêje, em te di geş-

bûn û pêşveçûnê de weka Dara Tûba bi qebîliyet dibînin. Ji xwe tu wisa bi qabîliyet nebûyayî rewşenbîrên weke Ehmed ê Xanî û Feqî yê Teyran berhemên xwe bi te ne dinivîsandin. Ronakbîrên weke Xelîl Xeyalî û Bedirxan li ser te vekolîn nedikirin.

Lêbelê ew zana bûn, lê em nezan in. Me êdî çewtiya xwe fam kiriye û em ê tobe bikin. Em ê şopa wan zanayan bajon.

Em ê bi zarokên xwe, bi dê û bavên xwe, bi heval û hogirên xwe re bi te bi axifin.

Em ê pexş û helbestên xwe bi te binivîsin.

Stran û kilamên xwe em ê bi te bibêjin. Di radyoyê de em ê li te bigerin û nûçeyan ji te guhdar bikin.

Di teyîbên xwe de em ê te deynin ser. Şanoyan bi te bileyizin.

Lo zimane xweş! Zimanê hêja!

Ko me van sozan anî cih, tu jî me efû bike. Tu li me gilî neke li welatparêziya me.

Ziman! Ko hindik be jî, heger dilê te xweşbûbe, ew besî min e.

Îcar tu destûr bide, ez ê bi gel re bipayivim.

Ey serokino! Karbidestino! Rewşenbîrino! Mamosteyino! Melano! Hunermendino! Hozanino! Karkerino! Xwendevanino! Bav û dêyino! Xwuşk û birano û kulilkên welêt, zarokino!

Dest bidin hev, saz bidin hev. Bi zimanê xwe biaxifin. Bi zimanê xwe binivîsin. Bi wî guhdarî bikin. Ko em vê carê jî bêxîretiyê bikin, gunehê me ti car nayê efûkirin. Lewra keyseke wiha cardinê na-keve destê me.

Bizanibin ku vejandina ziman, vejandina çand û huner e. Vejandina çand û huner jî, pêşveçûna gel e. □

# MA ÎSLAM ZIMANÊ KURDÎ BIPAŞDE XIST?

Îbrahîm Xelîl Molazade

**Y**a ku min diêşîne ev e ku hinek nivîskarê edebiyata Kurdî, derheqê pêşxistina edebiyata Kurdî, tada li dîne Îslamê dikin. Û Îslamê derheqê paşdemayîna edebiyata Kurdî li ser kursiya bersûc (sanik) didin rûniştandin û mahkûm dikin. Dibêjin: "Îslamê rê li zimanê Kurdî girt û nehişt ku zimanê Kurdî bibe zimanê pêşketî yê nivîsê"(1)

Bi baweriya min, ev ji ciheta emelê diwar manîdar in. Lewra dijminatîyek ji Îslamê re di nav van fikran de xuya dike.

Lêbelê em baş dizanin ku temamiya zimanên cihanê ji ayetên Xwedê ne. Xwedê teala ji bo naskirina hevûdu ya merivan reng û zimanê wan cihê kir. Lewra bi vê rewşê kesek ji kesekî bi qîmettir û mezintir nîne. Qîmet û mezinbûn bi teqwabûnê ye. Lê dîne Îslamê ti carî reng û zimanê merivan înkâr û qedexe nekir. Him jî çi hacet e! Ne bi tenê yên xelkên misliman bil'eks teve tebayên xeyrî muslim jî werge ye. Erê esas û hîmê Îslamê Qur'an û heclîsên Pêxember in. Ewan jî bi eslên xwe erebî ne. Ji bona hînbûn û fêhimkirina Qur'an û sunetê, erebî pêwîst e. Lewra destxistina ilmê Îslamê bi baş zanîna zimanê erebî ve girêdayî ye. Lê tefsîr û mana Qur'an û sunetê bi hemû zimanê xelkên misliman te tarîfkirin û salixdan.

Ji ber ku Îslam dîne xelkên misliman e û dînekî bi qewet e, helbet ewê tesîra Îslamê li ser zimanê wan hebe. Mîna îro ku çito zimanê Ewrûpayî tesîrî li ser zimanên dinya sêyemîn dike... Lê tesîra erebî û zimanên Ewrûpayî cihê ye. Ferqa wan mîna çiya ne. Lewra zimanê Ewrûpayî bi darê zorê û bi hukmê emperyalîzmê li dinya

sêyemîn hate hakim kirin û zimanê xelkan paşde hiştin (mîsal: Cezayir û her wekî dewletên din yê Efrîqî û Hindistan). Lê çî çax Îslam bo edebiyata Kurdî bû senc û bend pê ve û nehişt ku pêşde here? Halbo ku em bala xwe bidine dîroka edebiyata Kurdî, berî Îslamê ti tiştêkî bi rewşen xuya nake. Madem ku werge ye, Îslam ji çî re bûye senc û bend. Û çî paşde hişt. Bil'eks edebiyata Kurdî bi Îslamê re di xwe liviya û hêdî hêdî pêş de çû. Lewra nivîskarên edebiyata Kurdî ya kevn nêzîkî temama wan misliman in. Nemaze şêx û mela, feqî û telebê medresan in (mîsal: Ehmedê Xanî, Melê Cizîrî, Feqiyê Teyran û hwd). Hê jî li medresên Kurdistanê vekirin û tefsîra dersan bi zimanê Kurdî ye. Li milê din, çima edebiyata Kurdî li nav Kurdên Yezîdî yan jî Filan de bi pêş de neket. Bil'eks paş de mayîna edebiyata Kurdî bi ketin û qedexekirina Îslamê ve girêdayî ye. Lê mixabin dewletên Ewrûpayî ji hemû kul û derclên rojhilat Îslam bersûc kirin. Ez bawerim ku kul û derclên xelkên rojhilat bi destên Ewrûpayîyan dûvre jî bi destên kûklayê wan ê herêmî derketin.

Yek jî: "Di sedsala heftan de ketina Kurdistanê ya orduyên Îslamê ku bi darê zorê Kurd qulipandin ser dîne Îslamê"(2) ye.

Me van şorana pîr bihîstin. Lewra van şorên dijminê Îslamê yê qedîm in. Em baş dizanin ku kafir bo reşkirina Îslamê pîr xebitîn. Dixwestin ku dîne Îslamê di şexsê Muhemed de bixewînin. Mexsûsî ereban bikin. Pê ve di navbeyna xelkên din yê misliman û navbeyna Îslamê vekin. Wan

xelkana dîsa vegeînin cahiliya kevnar. Ji bo vê kemînê adet û orfê wanê cahilî û şirkî derxistin holê û pesnê wan dan. Dûvre Îslam li ber çavên wan reş kirin. Ji bo çand û hunera xelkan dijmin îlan kirin.

Berî her tiştî Xwedê rebê aleman e. Temamiya xelkên cihanê teve reng û zimanê xwe ebdê wî ne. Reng û ziman û çanda wan bo qebûlkirina dînê heq meni' nîne. Îslam dînê ereban bi tenê nîne. Ew ji temamê merivên cihanê re ji aliye rebê wan de hatiye şandinê. Xelkên misliman bi rengê Îslam hatine boyaxkirinê

Îslamê ti carî bidarê zorê insan nequlipandiye. "Di dîn de zorandin tne. Lewra heq û batil ji hev veqetiya ne." (Beqere: 256) Belê Xwedê dixwaze hemû kes misliman bin.

Îslam, di navbeyna xwe û însanan de ti zordariyê qebûl nake. Çiqas kaniyên fitne û fesadiyê, zilm û zordariyê hebin dimiçiqîne. Dûv re teblîxê bi serbestî li wicdana merivana azad dike. Lê ku bi zordariyê bûya di nav welatên misliman de wê kesên xeyrî muslim tinebûna. Lê ji bo fehmên azad her tişt li holê ye.

Xelkên ku Îslam qebûl kirin û bûn misliman di tengayî û ferehiyê de ji bo parastina dînê xwe, her tiştê xwe bêgûman feda kirine. Êdî çand û huner û jiyana xelkên misliman bi Îslamê bingeh girtin e. Heta mislimanên hêja û şiyar hebin kax û gîhayên nav zeviyan bêminet in.

(1) Mehmet Uzun, *Destpêka Edebiyata Kurdî*, Weşanên Beybûn, Ankara sh. 23.

(2) Mehmet Uzun, kitêba nav derbasbûyî.

## REWŞA ME

Şah û siltanan  
Em lê xapiyan  
Bi wan gotinên  
"Hûn şêrên çiyar"

Timî li newalan  
Li dûv sewalan  
Nehişt hişyar bin  
Gelê me Kurdan

Kanên dibîstan  
Hey şah û mîran?  
We tev hiştin em  
Korfam û nezan

Li vî niştiman  
Xwîna me Kurdan  
Mêj ve dirjînin  
Wek avê çeman

Xwîna wan rijand  
Mazlûm tev qijand  
Nalenalê wan  
Ersê jor hejand

Bi gotin û bêj  
Naçe ev qirêj  
Li benda we ye  
Ew şevên dirêj

Abdullah Aydın

## NUQURÇ

Mêro umrê te çûye bi teq teq û req reqê  
Tif rehmet nehesibîne, nebe weke beqê  
Xelq û alem ji heyvê li halê te dinêrin  
Li ber cehaleta te, merev dike biteqê

Mela Qasim

## nûbihar

KITÊBÊN ME YÊN  
LI BER ÇAPÊ:

- 1) NIMÊJ DIKIM
  - 2) BEDIUZZAMAN'IN
- VOLKAN YAZILARI

# DI HÊLA DÎROK, ÇAND, EDEBIYAT Û ZIMANÊ KURDÎ DE XEBATÊN HÊJA

Lokman Polat


Ji 1970 yî û vir ve, li ser dîrok, çand, edebiyat û zimanê kurdî xebatên pîrr hêja hatiye kirin. Li Kurdistana bakur, berê ewqas kes nizanibûn bi zimanê kurdî bixwînin û binivîsin. Pirtûkên ku bi kurdî hatibûn nivsandin, pîrr tinebûn. Ewên ku hebûn jî, di nav gel de nehatibûn belavkirin. Pîrr kêma kes bi wan haydar bûn.

Pirtûka Musa Anter ku bi kurdî nivîsandibû (navê wê *Birîna Reş*), di nav ronakbîran de dihate gerandin. Lê pişt re di nabeyna 1970 û 1980'yî de, weşanxana Komal, Yontem, Kava, Korral, Çira û Riya Azadî li ser dîrok, çand û zimanê kurdî pîrr pirtûkên hêja weşandin. Di wê demê de çend kovar jî der hatin ku bi du zimanan; bi kurdî û tirkî çap dibûn. Kovara *Rizgarî*, *Tîrêj*, *Riya*

*Azadî*, *Roja Welat*, *Jîna Nû* û *Ciwanên Şoreşger ên Demokrat* ji bo pêşdebirina ziman û hînkirina xwendin û nivîsandina zimanê kurdî, xebatekê pîrr rind kirin. Di nav rûpelên van kovaran de çîrok û helbest bi kurdî dihatin weşandin. Ev kovaranan ji bo hişyakirina gel, çareserkirina problemên ziman, çand û tore, rewşa civak û rêxistina wê û li xweyî derketina

doza netewî de rolêkî mezin le-yistin.

Li ser ronahîkirina dîroka kurdan, ew weşanxanê ku min li jor navê wan nivîsand, gellêk pirtûk çap kirin. Pirtûka M. Emin Zekî *Dîroka Kurdistan*, Îhsan Nurî *Koka Kurd*, a Îbnul Ezreq *Dîroka Kurdên Merwan*, a L.Rambout *Dîroka Kurdistanê a Nûjen*, a



Dr.Şirvan *Di Iraqê de Tevgera Netewayî a Kurd û Nîjadperestiya Baas* û wek din, bi

dehan pirtûk ku li ser kurdan hatibûn nivîsandin, bi destê van weşanxanan hatin weşandin.

Piştî ku li Tirkîyê cunta leşkerî a faşîst di sala 1980'yî de hat ser hukum, hemû kar û xebatan qedexa kir. Lê xebat nehat seknandin. Tevgera netewa kurd, ronakbîrên welatparêz, li ser problemên kurdan ên siyasî, çandî û wd. xebata xwe berdewam dikin. Îro ev xebat ji doh pirrttir, xurtir û baştir tê kirin. Meriv gava li van xebatên hêja ku hatine kirin mêze dike, pê dilxweş dibe. Di xebatên berê de helbet kêmanî jî hebûn. Lê ew kêmaniyên ku hebûn, anuha jî henin, divê pêre pêre bêne rakirin. Tiştên ku berê nehatibû kirin û anuha hêdî hêdî tê kirin pirrin û ev tiştana gava tên kirin mirov pê dilşa dibe.

Di hêla dîrok, çand, edebiyat û zimanê kurdî de xebatên hêja ku hatin kirin û me li jor bi kurtî qala wan kir, di nabeyna 1975 û 1980'yî de hatibû kirin. Piştî 1980'yî cunta faşîst ya leşkerî hat ser hukum û sazûmaneke faşîst û xwînxwar ava kir. Ji bo vê yekê xebata di warê weşanê de hat seknandin. Piştî 1987'a vir ve carek din weşanên kurda dest pê kirin û li ser (di hemû warî de) pirsên kurda xebitîn; kovar û pirtûk weşandin.

Li ser ziman, çand û dîroka kurd weşanxana Firat-Dîjle, Doz, Koral, Med, Beybun, Dîlan, Berfîn, Deng, Zîlan, Firat, Melsa, Pencere, Medya Güneşi û Oz-Ge xebatê baş û hêja kirin û dikin. Çand û dîroka kurda derdixin ronahiyê. Wek nimunê; weşanxana Firat-Dîjle sê pirtûkê hêja weşand. Yek jê a nivîskar Botan Amedî *Dîroka kurd û Kurdistanê*, ya din a nivîskar Hasan Yildiz *Ji eşîrtiyê ber bi*

*netewatiyê: Kurd*, a sisiya jî a Luîs Rambout *Dîroka Kurdistanê a Nûjen e*.

Nuha kovara Welat û Nûbihar xwerû bi zimanê kurdî derdikevin. Hinek kovar jî bi du zimanî; bi Tirkî û Kurdî derdikevin. Ew kovar ev in: 1- *Deng*, 2-*Serketin*, 3-*Newroz*, 4-*Rewşen*, 5-*Newroz Ateşî* (Agirê Newroz), 6-*Medya Güneşi* (Roja Medya), 7-*Govend*, 8-*Ozgur Halk* (Gelê Azad), 9-*Vatan Güneşi* (Roja Welat).


Ev hemû kovar jî li ser ziman, çand û dîroka kurd û kurdistanê, weşaneke hêja dimeşînin. Di kovara *Dengê* da A. Baran, di kovara *Medya Güneşi* de M. Alî û di kovara *Vatan Güneşi* de Selîm Dîjle li ser zimanê kurdî û hîn-kirinê nivîs dinivîsînin.

Li derveyê welat, li Ewropayê jî çend weşanxane ji sala 1970 û 1980'yî vir ve, li ser ziman, çand û dîroka kurda xebatên xwe berdewam dikin. Ewan weşanxanan bi dehan û bi sedan pirtûk çapkirin û weşandin. Ew weşanxanê ev in: 1-Roja Nû, 2-Welat, 3-Hêviya Gel, 4-Jîna Nû, 5-Deng, 6-Komkar, 7-Agrî, 8-Apec, 9-Çanda Kurd, 10-Orfeus, 11-Çanda Nûjen, 12-Xaneyê-Betêyî, 13-Weşanxana Kurdistan û wd.

Li Ewropa kovara *Hêviya Gel*, *Berhem*,

*Nişîman*, *Kurdistan Press*, *Dengê Welat*, *Têkoşîna Sosyalîst*, *Berxwedan*, *Serxwebûn*, *Dengê Komkar* û *Bergeh* bi du zimanî (Kurdî û Tirkî) derdikevin. Nuha hinek ji van kovaran dernakevin.

Kovarên ji bo zarokên biçûk *Hevî* û *Kulîlik* û sê kovarên henekiyê (mîzah) *Îsot*, *Mîrkût* û *Zengil* berê çend hejmar derketin, lê nuha ew jî dernakevin. Li Ewropa bi zimanê kurdî pirtûkên roman û çîrokan pîr derketine. Nivîskar Mehmed Uzun çar (4) roman bi zimanê kur-



dî nivîsandî yê û weşandiyê. Mahmud Baksî, Şahîne Bekirê Soreklî, Lokman Polat, Hesenê Metê, Bavê Nazê û bi sedan nivîskarên kurd bi kurdî roman û çîrok dinivîsîn. (Nivîskarên kurd ên Kurdistanê başûr û rojhilatê, bi pirranî, bi kurdî roman û çîrok dinivîsîn, min wan nejmart.)

Nuha li Ewropayê çend dîrokzanên kurd hene, li ser dîroka kurd û Kurdistanê xebatên hêja dikin û berhemên hêja derdixin holê. Ev dîrokzan û lêkolînan ev in: Hesen Yildiz, Ethem Xemgîn, M. Emîn Bozarlan, Kendal, Murad Ciwan, Rohat, Nacî Kutlay, Mahmud Lewendî, Malmisanij, Huseyîn Beysulen, Botan Amedî û hinek kesên din. Hinek dîrokzanên Ewropayî jî li ser dîrok û civata kurda lêkolînan dikin, berhemên baş derdixin holê.

Nuha ez dixwazim li ser du tiştan bisekinim: 1- Bi kurdî nivîsandin li ser felsefê, 2- Wergerandina klasîkên edebiyata cîhanê û bi zimanê kurdî weşandina wan.

Di nav welatparêz, şoreşger û ronakbîrên kurdên Kurdistanê bakur de bi kurdî li ser tiştên siyasî dihatin axaftin. Lê li ser felsefê kesek bi kurdî nedixaxîfî. Li ser hemû tiştên bi kurdî, nivîs hatibû nivîsandin, lê li ser felsefê nivîs bi kurdî nehatibû weşandin.

Di vê demê de li ser felsefê bi kurdî nivîsên baş derdikevin. Di warê nivîsandina kurdî; li ser felsefê de, valahiyeke mezin hebû û heye. Nuha bi xebatê, ev kêmani, hendikbe jî ji holê radibe. Ev tiştêkî pîr xweş û girîng e. Lê ev karê giran divê li ser milê kesî an kovarekê de nemîne. Ronakbîrên kurd di vî warî de xebat bikin wê berhemên baş û rind bînin weşandin.

Xala duyem ku ez dixwazim li ser bisekinim, ew jî edebiyata klasîk a cîhanê û wergerandina wê bi zimanê kurdî ye. Edebiyata klasîk hema hema bi hemû zimanan hatiye wergerandin. Ji ber ku ew netewên din ên cîhanê xwedî dewlet in û zimanê wan azad e, wan edebiyata klasîk

pîr rehet wergerandine zimanê xwe. Ê me kurda dewleta me tine û zimanê me qedexe ye. Ji ber van sedemên civakî û dîrokî li Kurdistanê bakur heta nuha berhemên edebiyata klasîk bi kurdî nehatiye wergerandin û weşandin. Ev tişt jî ji bo civaka me û zimanê me kêmaniyek e. Lê ji bo ku heta nuha şert û şûrtê vî tiştî tinebû, ev pirtûkên klasîk nehatine weşandin. Îro, di vê demê de li derveyê welêt, şertên wergerandin û weşandina wan tiştana heye. Divê hemû ronakbîr (rewşenbîr) li ser bifikirin û di vî warî de dest bi xebatê bikin.


Di vî warî de weşanxana Welat xebateke pîr hêja kir. Ji edebiyata klasîk a Rûs, çend pirtûk wergerandin kurdî û weşandin. Pirtûka Puşkîn, *Keçika Kapîtan* û kurte-çîrokên Çexov, bi kurdî derketin. Min pirtûka kurteçîrokên Çexov a bi kurdî, *Mirina Karmend* xwend. Bi rastî jî, meriv bi zimanê xwe tiştên klasîk bixwîne pîr xweş e. Min berê hemû çîrokên Çexov (bizimanê tirkî) xwendî bû, lê bi qasî ewa

kurdî ji min re xweş nehat.

Pirtûkên Dostoyevskî, Balzac, Puşkîn û Henrî Boch hatine wergerandin û dê bi zimanê kurdî bînin weşandin. Ev karê wergerê tiştêkî pîr baş û rind e, karekî hêja ye.

Wergerandina pirtûkên klasîk karekî zor û zehmet e. Lê divê mirov baş li ser bixebite. Em kurd çima bi zimanê xwe helbestên Aragon, Nerûda, Gothe û Mahmûd Derwêş, an jî çîrok û romanên Kafka, Gladkov, Ostrovskî, Dîmov û Gorkî bi zimanê xwe nexwînin. Ger ronakbîrên kurd pirtûkên vana wergerînin kurdî, emê karibin wan bi zimanê xwe bixwînin. Bi wergera van berhemên klasîk wê zimanê me pirtirîn xurt bibe û zengîn bibe.

Wek ku min pêşî jî got, divê di vî warî de, pîr xebat bê kirin û pirtûkên klasîk û nûjen ên edebiyata cîhanê bînin wergerandin. □



# ZIMAN MOHRA QEDERÊ YE

Naci Gülmez

**Z**iman, di nav însanan de ragihandina civaktiyê tîne cih û xwe bi deng û nivîsandinê nîşan dide.

Ragihandin di nav qewmekî de çiqas zêdebe, xwenasiya wî qewmî jî ewqas zêde dibe û di nav netewan û ometê de jî ewqas xewdiyê cihêk birûmet dibe.

Gelê Kurd dema ku bi Îslamê mişerif bû û vir de herwext xwe di sefa Îslamê ya pêşîn de nîşan da. Ji Qafqas bigre hetanî Çîn û ji Ūris bigre hetanî Moxol, Kurd di eniya şer de li pêşiyê bûn. Hatine xapandin lêbelê tenezulî xapandina hevalên xwe nekirine. Dem hatiye bi Îslamê hatine xapandin, dem hatiye bi zordarî hatine kerrkirin.

Di nav zordariyê de derba xedar qedexkirina ziman, çend û edebiyatê ye. Ji ber ku insan bixwaze miletekî ji hev belav bike, zimanê wî ji hev belav bike bes e. Kemal jî, ji Kurdan re ev rê daniye û ev rê hetanî 1990î hatiye. Bi vî pîlanî pir a nav bav û law, hilşandiyê. Armanca van kafiran du tişt bûn: A yekê: Bi cehaletê Kurdan ji hev belavkirin. A dudiyar: Netîca a pêşîn de, Kurdan ji Ommeta Îslamê qetandin. Îro tu mêze dikî ku ev zindîqanan gehîştine armanca xwe.

Kesê ku vê gotinê qebûl neke, îsbata wî wuha ye: Di vî memleketî de çar qisim hene. Yek Tirk in, ku ekserê wan mamûrê dewletê ne û yan jî di fabrîqan de karker in. Duyem: Ne misilman in (File û cihû) û ekserê wan gewherfiroş in. Sêyem: Laz in. Ku ekserê wan mitehît û xwedî sen'et in. Çarem: Kurd in. Ku eksere wan karkerê kanalîzasyon û însaat û hwd Sebebê vê yek tişteke ku zimanê me ji masatê hatiye rakirin. Ji ber vê yekê, mamoste û rêzanên me herdu Seîdan (Şêx Seîd û Bedîuzeman

Seîd) jî dizanibûn ku Kurd wê di îstîqbalê de perîşan bibin. Ji bona ku ji vê perîşaniye re bibin bergeh, ev ayeta kerîme ji xwe re ferz-ul eyn qabûl dikirin: "*Qewmê xwe ji tarîtiyê derxe robnabtyê.*" (Îbrahîm: 5)

Di têkoşîna li hemberê zilmê de Seîdekî serê xwe, yekî jî heyata xwe feda kir. Dîsa jî bergeha zilmê li ser miletê Kurd nehat girtin. Ji ber çî? Ji ber ku qewet ji heqê derket û heq kete qewetê. Bi zilma xwe her sibe bi zarokên Kurda "Türküm, dogruyum, çalışkanım..." didin gotin. Heta ev jî ji Kurdan re kêm dihat dîtin. Heta bi destê misilmanan jî zilm didan kirin. Meselên: Di kitêbên Seîd ê Norsî de bêjeyên Kurd û Kurdistan hatibûn derxistin. Yanê van misilmanên bi şîûr (!) ê ku bi rejîma Kemalîst ve entegre bûne, misteheqê vê gotina Mamoste Seîd ê Norsî dibin: "Dostê nezan, bi nezanî alîkariya neyarê zana dike."

Bi kurtî, rejîma Kemalîst çerxa xwe li dar xistiye û hinek misilman jî bûne diranê wê çerxê û qewetê didin zilmê. Hedîsa şerîf de wuha tete gotin: "Kufir berdewam dike, lêbelê zilm berdewam nake." Zulm muheqeq ewê serê zaliman jî bixwe. Lêbelê me behayê vê zilmê gelek giran da. Serxwebûna me ya hetanî îro jî bi saya dewlemendiya zimanê me ye. Hetanî du sal berê jî, rojname, kovar û kitêbên Kurdî qedexê bûn. Bi helbest û çand û qisedanê ve li hemberê zilmê hetanî îro li ser xwe sekiniye. Evqas zilm û zordarî dihat kirin ku dîsa zimanê Kurdî ti wextî mihtacî muesesên weke "Türk Dil Kurumu" nebûye û nabe jî.

Dema zimanê Kurdî jî weke zimanê Tirkî hestiyê wî ji xwe, goştê wî jî ji zimanê

maîn bûbûya, niha zûde goştê zimanê Kurdî ji alî zaliman de hatibû qedandin. Meselên: Di tirkî de ji jina bira, xal û ap re dibêjin "yenge". Di Kurdî de jinbira, xalotin, amojin, yanê ji her yekê re navek heye. Ev jî nîmetekî mezin e ku Xwedê bexşandiyê me.


Yanê zalim bi çavê maddî mêze bikin, ev zimanê dewlemend fêda wî ye jî û ji medeniyeta dinî re jî fêda wî wê çêbibe. Misilman jî hinek bifikirin ku zimanê Kurdî -ku di memleketê Îslamê de sî milyon kurd hene- ji bona menfaeta ometê ko serbest bibe, hê bixêre. Lazime misilman mîsaqê millî ji aqlê xwe derxînin û hê fireh bifikirin.

Çawa gelek însan îro bi zimanê Tirkî ji kitêbên Îslamê îstifade dikin, zimanê Kurdî jî ew ê hê zêde îstifade bike û pêşde bibe.

Bi kurtasî, di kîjan masatê de dibe bila bibe, di piştê şênbûn û hûnermendî û pêşveçûna netewî û alemgiştî de, ziman heye.

Ji ber vê yekê, rê ya ku mezinên me ji me re vekirine, em tê de neçin -rêya Xanî, Feqî, Cezîrî û Xeyalî- wextê serê xwe rakin ew ê ji me re bibêjin: Ey ewladên mîrasxwar, hun in medarê mezin û piçûkên me. Nesla li pey me jî were, ew ê jî bibêjin: Ey bavên me yên teral, hun in medarê if-

tixara me. Yanê emê ji herdu aliyan de sîle bixwin. Ji ber ku em sîlên wan neynin ser xwe em guhên xwe vekin, makîna nizamê alem ew e ku jê re hîkmeta îlahî tê gotin, weke xetên telekomînkasyonê ku li alemê giştî belav bûye, û ev hîkmeta îlahî ku sazgeha qanûnên nûraniyê îlahî ne ji bergehê ezê de tiliya qedere rakiriyê û emrê ser me dike: Ger hun ji xewê ranebin, wê wahşet di deşta cehaletê de we ji hev bela bibe. Û ew ê her sê ên cewherê we -Îslamiyet, însaniyet û mihabeta milî- ji destê we bigre. Mihafaza wan hersê cewheran bi xwendin û bi zimanê zikmakê ye.



Çima ku zimanê zikmakî, mora qedere ye. Suretê însaniyetê û medeniyetê di rûpelê ziman de tê neqîşkirin. Zimanê zikmakî ji bo ku tabî ye, bê teklîfatî tîne zîhnê mirov. Ji ber vê yekê, zimanê zikmakî wek nexşê li ser kevir bê çêkirin, wenda nabe.

Medarê iftixar, mamostên Xelîlê Xeyalî û Celadet Bedirxan, bi rêziman û elîfba xwe ve ji me re bingehê danîne. Em jî, ehlê hamiyet û welatperweran teklîfê ser vî bingehî dikin ku em jî avayên xwe li ser vê bingehê çêbikin; ji bona ko ruhê mezinên me jî di qebra wan de şad bibin. □

# NAMEYÊN BÊCEWAB/8

## 2 Adar 1991

Xemgîniya dest pê kirina bi nameyeke bêcewab î din  
 Binihêre, tengzarî ji şehdemar nêzîktir e bi min  
 Pêşî Endilûs şewitî, pîrr paşê keştiyê min, û ez  
 Tariq, li Endilûs jî peyda nekirî, tiştê ku ez lê digirim

Gereke besît bin, nameyên ji rêzê bin tiştê ku ez dinivîsim  
 Hebe nebe, nameyên besît û ji rêzê, yên ku ji  
 Dilgeşiya nakeve desta, ji perpitîna bênihayet  
 Ji diyarê sorgulê manayê, yê ku naye fetihkirin, behs dikin

Bila yê kesê din bin fethê mezin, yê ku eslen tinîn in  
 Fetihkirina du çavê demdemî besî min in  
 Hevtonê divegerim serê çîroka xwe, ji nuh ve dest pê dîke jîyan  
 Cardin tebesum dikin sorgulê manayê ji el-Hamra nuh

Ev karewan ji kû ve têt wisa bi kû ve diçit  
 Çoyê pola di dest de, çarixê pola di pê de, li pêş bîreke kûr  
 Tê de ez im, loma hişk bûye bîr, bîreke bêav, û hulya  
 Bi Misrê, yan bi diyarê eşqiya ve diçit ev karewan, tikes nizanê

Dibe ku mana, di siya darê hêşîn de, bi raketineke  
 Kûr, bi li bendî man ku sorgulê mana, cilê xwe ji xwe kin  
 Ê ser ta pê uryan, balî min ve baz bidin  
 Karê were bi dest anîn û fetihkirin

An jî di negerriyê de ye mana dibe ku  
 Yan bi girtina nefesa xwe û guhdan bi bédengiyê de ye  
 Ma kîja Leyla taliya eşqê, kîja sorgulê manayê yên talî  
 Kîja jîyan, kîja diyar, kîja bihar, ma kîja talî

Sabah Kara

# HELKIRINA PIRSGIRÊKA KURDAN

Dr. Omer Kemal

**D**êrê (kilisê) zilmeke siyasî ya mezin dikir. Ji ber vê yekê papa û milûkên Ewropayî pev çûn. Milûkan îqtîdara siyasî xistin destên xwe û ji papa re sirf serokatiya rûhî, yanî ya dînî hiştin. Piştî vê yekê zilamên dînî îsyan kirin û dest bi hereketa reforman kirin. Di dawiya vê hereketê de, hereketa neteweyî di Ewropayê de derket holê. Dêrên Îngilîztan, Swêd, Îskoçya, Norveç û Danimarqeyê ji dêra Romayê qetiyar. Vê hereketê bi xwe re destpêka hereketa netewî û zefbûna filetiyê anî. Piştî hingê netewetî bû nezeriyeke felsefî û tezeke siyasî û îçtimaî. Ev teza hanê, civakan welidand li ser vê bingehê, li ser erdekî mûeyyen û xeberdana bi zimanê wî erdî û menfaeta maddî û yekitiya dîrokê li van deran dest bi hukmê kir.

Piştî vê, di navenda qernê nozdehê miladî de bi destên fileh û cihuya ramana netewîtiyê hate neqilkirin bal alema Îslamê. Meselen li paş hereketê netewîtiya Tirkîyê de cihu hene. Ji roja derketî heta îro rêzan û serokên partiyên Ereban yên netewî de hemû fileh in. Munîf Er-Rezzaz yekî ji mezinên hereketa partiya Baas'a Sosyalista Erebi ye, dibêje:

*"Ev hereketa netewî ya di rojbilat de şîn dibe, di rojbilata me ya erebî de, hereketek wisa ye ku reyên wê li ber stiya emperyalizmê şîn bûye."*

Hakeza Corc Entanyus di pirtuka xwe ya bi navê *Ştyarbûna Ereban* de dibêje:

*"Bêguman hereketa netewî ya erebî şîn bûye bi tesîra Emerîqa, ji terefê zanînge-*

*ba Emerîqa ya li Lubnanê û bi alîkariya hereketa mîsyonertiyê."*

Ji vê yekê baş tê zanîn ku, hereketê netewî ji Rojava (Xerb) hatiyê û li nav civakên Îslamê de şîn bûye.

Hereketa Kurdiya netewî ji hereketa netewîya Tirkî û Erebi cihê ye. Hereketa netewîya Kurdî di serê vî qernî de derket holê. Meselen komala siyasiya Kurdî ya yekem di sala 1908 de li bajarê Stenbolê bi navê "Kurdistan Tealî Cemiyetî" (:Komela Bilindkirina Kurdistanê) ava bûye. Sazgêrên ve komalê jî Emir Elî Bedirxan, Korgeneral Şerîf Paşa, Ebdilqadir Şemzîn û Damat Zulkifl Paşa bûn.

Xwedê Teala meriv kirine netewê û qebîle. Binêre Xwedê ezze we celle çî ferman dîke:

*"Gelf mertvan! Bêguman me hun ji mêrek û jinekê xulîqandîye û me we kirtîye netewe û qebîle, da hun hev nashikin. Bêguman qençtirînê we li nîk Xwedê, muteqîtirînê we ye."* (Hucûrat: 13)

Xwendevanê delal! Binêre. Îxtîlafê netewan û cinsan sunnetek ji sunnetên Xwedê Teala ye. Qur'ana Kerîm îxtîlafê netewe û zimanan înkâr nake. Çi ku îxtîlafê netewan û zimanan li nav mexlûqan de mu'cîzeke ji mu'cîzên Xwedê ne:

*"Xelqkirina asimanan û îxtîlafê ziman û rengên we, ji ayetên (mu'cîzên) wî (Xwedê) ne."* (Rûm: 22)

Hakeza Xwedê Teala, peyxemberên xwe jî bi zimanê neteweyên wan rê kiriye. Xwedê ezzê we celle ferman dîke:

*"Çîqas peyxemberên me rêkirtin, me bi*

zimanê neteweyê wan rêkiriye, da (emrên Xwedê) ji wan re beyan bikin.” (Îbrahîm: 4)

Ziman ni’metekî şamil e ji bo hemû mirovan. Ji boyi peyxember-bi emrê Xwedê-mirovan ji tarîtiyê derxe û bibe bal ronahiyê lazime (pêwîst e) ew peyxamber bi zimanê wan mirovan hatibe şandin.

Heger bi zimanê wan nehatibe şandin, ne ew dikare emrê Xwedê ji wan re beyan bike û ne jî ew dikarin ji wî, emrê Xwedê hîn bibin. Wextê ev yeka hanê neye cih, peyxembertî jî nagehêje hedefa xwe.


Xwedê Teala Hezretî Muhammed aleyhîselam şandiye bal cemî’ê mexlûqan, lê dîsa bi zimanê qewmê wî şandiye. Çima ku jiyana wî mehdûd e. Ew kesên rîsaleta wî bigihênin hemû mirovan, neteweyê wî ye. Ji ber vê yekê Xwedê ezze we celle jê re ferman kiriye ku ewil neteweyê xwe û mirovên xwe yên nêzîk, dawet bike. Da temamê Cezîret’ul Erebê misilman bike û bike mal ji bo Îslamê. Ji ber vê yekê Cezîret’ul Erab ji bo kesên ku rîsaleta wî bibin bal cemî’ê parçên erdê, bû dergûş.

Bêguman Îslamiyet ne manî ye ku şexs xwe nisbet bike bal erdê xwe, neteweyê xwe û qebîla xwe. Meselên kesê li Misrê hatiye dinyayê Misrî ye, kesê li Êraqê hatiye dinyayê Êraqî ye û kesê li Pakistanê hatiye dinyayê Pakistanî ye. Çi ku li wê derê hatiye dinyayê.

Lêbelê Îslamiyet ji xeynî xwe ti sebebên ji bo yekîtiyê û yekgirtinan qebûl nake; sebebê yekîtiyê Îslam e, eqîda sererast e.

Xwedê Teala ferman dike:

“Bibêje: “Heger bavên we, zarokên we, birayên we, jinên we, mertvên we, ew malên ku we bi destê xwe xistî, ew ticareta hun ji kesada wê ditirsin, ew meskenên hun jê bezdikin, ji we re jî Xwedê û peyxemberê wî û jî cîbada di rêya wî de şêrîntirbe, naxwe Xwedê beta fermana xwe bîne cih bisekinin. Xwedê civaka fasiqan bîdayet nake.” (Tewbe: 24)



Xwedê Teala, ji bo me sîrf bi dîne Îslamê razî bûye û weha ferman kiriye:

“Îro mîna dîne be-we îkmal kir. Mîna ni’meta xwe li ser be-we temam kir. Ez ji bo hewe bi dîne Îslamê razî bûm.” (Maîde: 3)

Ew tiştê Xwedê ji bo me pê razî bûye Îslamiyet e, ne ti tiştî din e. Qey îmkana wê heye ku ew tiştê Xwedê Teala ji bo me pê razî bûye -ku Îslamiyet e- em berdin û ew tiştê ku beşeran (merivan) çêkiri, em baweriyê pê bînin û wekî dîn ji xwe re qebûl bikin?

Çi kesê netewîtiyê û çiqas felsefên beşerî ji xwe re wekî dîn qebûl bike, emelê wi ne sererast e û rêya ew pê de diçe xwehr e. Doza netewîtiyê dozêk ne rast e.

Ji dema Êraq hatî fetihkirin ve Kurd misilman bûne. Dîne Îslamê kirine taca serê xwe û pê îftîxar kirine. Li ber de şer kirine û xwe dane kuştin. Ji nimêjkirina ekserê wan tê zanîn, ka çiqas ji Îslamê hez dikin. Ji jîna wan tête zanîn ka çiqas sadiq in. Misilmanên dinyayê, çî Ereb, çî Kurd, çî neteweyên din ên mayî hemû bi fermana Xwedê Teala bira ne:

“Bêguman misilman bira ne.” (Hucûrat: 10)

Bûne bira. Em ferqiyê naxin naveyna Kurd û Ereb û misilmanên din de. Em he-

mû ji bo razîbûna Xwedê Teala bûne birayê hevûdu. Bi vî awayî me fermana Xwedê ya di vê ayeta hanê de bicih aniye:

*"Me hun kiriye netewe û qebile, da hun hevûdu nasbikin. Qençtirînê hewe li nîk Xwedê, mutteqîtirînê hewe ye."* (Hucûrat: 13)

Ji vê ayeta Qur'ana Ezîm tête zanîn ku pîvana qençtirîne teqwatî ye, ne nijadperistî ye.

Me li serê nivîsara xwe de got; hereketa Kurdî ya neteweyî di despêka vî qernê hanê de derketiye holê. Yanî ev harekata hanê di civakî ne Îslamî de, di civakî mayî li bin te'sîra ramanên neteweyî, nijadperistî û laîk de derketiye. Ew civak hatiye serîtîjîkirina bi şiklê ne Îslamî. Eqîde û şerîet û jîna Îslamî ji wê hatiye dûrîkirin. Mexseda me ji vê civakê ne civaka Kurdî bi tenê ye. Halê civakên misilmanên din jî wisa ye.

Hereketa Kurdî ya neteweyî qet rol nedaye Îslamê di helkirina vê pîrsgirêka mezin de. Lêbelê ne mumkin e ev pîrsgirêk bête helkirin li ser bingehên neteweyî û zordarî û asîmîlekirin bi hêzê (bi qewetê). Ancax Îslamiyet dikare vê pîrsgirêkê hel bike. Çi ku çi Kurd, çi Ereberkesê misilman Îslamiyet qebûl dike.

Hella Îslamî ji bo pîrsgirêka Kurda îbarret e ji van heqîqetên hanê:

1- Lazim e civakek bête damizrandin. Di wê civakê de hukmê Îslamî bête tetbîqkirin di hemû terefên jînê de. Hingê herkes mecbûr e teslîmê hukmê Xwedê bibe. Meriv di dewleta Îslamî de du qism in:

a) Misilman

B) Kafirên zimmî

Li vê civakê de mafên misilmanan jî û mafên zimmiya jî mu'eyyen in. Li vê civakê de tu mafên xusûsî ji bo Ereban, an jî ji bo Kurdan, an jî ji bo neteweyên mayî tunîn e. Mafên misilmanan hemûya yek in.

2- Piştî dewleteke Îslamî li gorî emrê Xwedê Teala hate avakirin, hingê herkes wê bighêjin heqê xwe. Tu manî tunîn e ji bo dewleta Îslamê ku hukmê zatî (otonomî) yê Îslamî bide her neteweye kê, di îşê îdare û îşên başqe de. Hingê wê dewleta Îslamî hukmê zatî bide Kurdan jî. Lêbelê ne ku Kurdan bêne veqetandin ji dewleta

Îslamî.

3- Zimanê Ereberkesê wê bibe alet ji bo hînbûna Îslamê û wê bibe sedemê yekîtiya siyasî û tederîsatê. Yanî zimanê Ereberkesê wê bibe zimanê resmî, ji bo dewletê. Ev ziman zimanek dînî ye, ne zimanek neteweyî ye. Zimanê neteweyî jî, wê bibe zimanê duwemîn. Herkesî bi zimanê xwe wê mijûl bibe û binivîse. Çi ku Xwedê Teala halo ferman kiriye:

*"Îxtîlafê ziman û rengên hewa, ji ayetên Wî (Xwedê) ne."* (Rûm: 22)

Ji ber ku îxtîlafê zimana ji mu'cîzên Xwedê ne, ne mumkin e tu ziman bêtin rakiri ji terefê tu kes û tu hukûmetan ve. Hem îmkana destdanserkirina (musadenekirina) tu ziman nîne. Çi ku ziman ji nîmetên Xwedê Teala yê mezî in. Ji ber vê yekê heqê Kurdan heye ku zimanê xwe yê neteweyî di mijûlbûn û nivîsandin û çapemeniyê de bikar bînin.

4- Dema hukmê Îslamê hate tetbîqkirin û meclîsa şûra ya Îslamî hate avakirin, hingê wê Kurd jî werin temsîlkirin di wê meclîsê de li gorî nifûsê xwe. Mumessîlên Kurdan wê bêne bijartin ji zilamên salih û dîndar.

5- Serokê dewleta Îslamî ne şert e ji neteweyeke mu'eyyen an jî ji mezhebeke mu'eyyen be. Ji bo serokê dewletê sîrf ew şertên hatî nivîsandin di pirtukên şerîetê de lazim in. Çi ku şertê eslî di serokîtiyê de ewe ku serok liyaqeta wî hebe ji bo vî îşî û zilameke emîn be. Çi ku fezîlet sîrf bi teqwatiyê ye. Xwedê Teala ferman kiriye ku:

*"Qençtirînê hewe li cem Xwedê, mutteqîtirînê hewe ye."* (Hucûrat: 13)

Resûlê Ekrem aleyhîselam halo ferman kiriye:

*"Kesê emelê wî ew bi şunda biştî, ne-sebê wî nîkare wî bi pêş de bibe."*

*"Tu fezîlet ji bo kesê Ereberkesê nîne, li ser kesê Ecem, jî xeyrî teqwattî."*

(Ev nivîsar ji hejmara yekemîn a kovara *Bangî Heq* a ku li Pakistanê bi zimanê Kurdî û Ereberkesê tête weşandin, hatiye wergerandin. (Werger)

Werger: **Serdar Botî**

# YA RAST, AGIR DORA XWE DIŞEWITÎNE

Metin Önal Mengüşoğlu

**P**irsgirêkên mirovatî yên ku li ser rûyê zemîn mewcûd in, yan perchak ji têkoşîna bingehî ye (têkoşîna ku ji ewil de di navbera mirovan de heye- W.), yan jî pêvajoya vê têkoşînê bi xwe ye. Di navbera herdu zarokên Adem, Hâbîl û Qabîl de berberiya ku destpêkir, nuqta wê ya esasî ev e ku, ji têkoşîna heq-batîl, zalim-mazlûm, mustekbîr-musted'ef, hîzbullah-hîzbuşşeytan re bûye gaveke ezêlî. Hemû mirov, çi zana bin, çi nezan; endamê yekê, leşker, yanî hemolê yekê ji van herdu wargehana ne.

Li ser rûyê zemîn, reng û ziman û nijada wan çi be jî, hemû endamên wargeha heq, mensûbê miletekî ne, Miletê Îslamê... Heger bi zanetî be ji wisa ye, bi nezantî be jî... Yanî ku ji bêhaybûnê, jîbîr bikin ku li ser axê dijîn jî, ew dîsa jî li ser axê ne.

Mîna vê yekê jî, bêyî ferqa reng, ziman û nijadê û bêyî qebûlkirina bêhaybûnê, hemû endamên wargehên batîl û beşên şeytanan jî, mensûbên miletekî ne, miletê kufre yê heq dapaçîn...

Du cur munasebet di navbera van herdu miletan de heye; yek munasebeta derve, yek jî munasebeta navxwe de..

Munasebeta derve; ji pevçûna Hâbîl û Qabîl bigrin, heta bi Tûfana Nûh, di çarçûva 'Deh Ferman'an de, munasebeta Mûsa û Benîsraîliya, munasebeta Îsa yê bavnebû û Benîsraîliya û heta bigihêje têkoşîna Muhemmed Eleyhîselam û muşrîkên hemnijadê wî yên Mekke, di se-


ranserê dîrokê de, cengên pîrr mezin ku dîrokê anîne holê û domandine û heta îro jî, di çarçûva xwe ya eslî de bi eynî usûl û diwariyê, bûye mîna gundoreke mezin î berfê û hatiye.

Danûstandina van herdu miletan ya di navxwe de, hê rengin e.

Miletê kufre, îcaba sazî û bûyîna wê, Ehabîl e, yanî perçe perçe ye. Wargeh û firqe û partiyên vî miletî, bêhejmar in. Lewra jê re mîheng û palpiştî tineye. Mantiq û xwastoka herkesî, mîhenga wî ye. Ji ber vê yekê ye ku merev dikare bibêje, çend mirovên kufre hebin, ewqasî jî mezhebê kufre henin. Ev mezhebana jî, hergav hevûdu dikurîsînîn, dixun û da-diqurtînin. Lêbelê carna carna ko bi wargeha dijê xwe, bi miletê mu'mîn re ceng dikeve holê, wê gavê te dît ku xwîna birayên xwe ji hawîra devê xwe alastin û hemû pev re dimeşin ser wargeha dijmin. Lê herpêyeke (reaksiyon) wisa tebîî ye.

Di navbera Miletê Îslamê de jî, îcaba bûyîna û saziya wî, cur cur ziman, reng û nijad henin. Lêbelê hemû dizanin ku tenê ji bona nasîn û zanîna hevûdu û damezîrandina medeniyeteke rengîn, wisa cur cur hatine xuluqandin. Hemû bi vê bawerî ku, ji Xwedê pê ve ti îlah tineye. Mîhenga wan jî, kitêba şandî û resûlê ku Xwedê hîlbijartiyê ye û ji bo rêbertiyê jî tenê vî resûlî qebûl dikin. Ev bawerî, bi tewhîda mu'mîna stewiya ye.

Bêşik xwediyê van herdu fikran jî mirov e. Mirov bi xwe jî mexlûqatekî bi



keramet e ku, Xwedê fucûr û teqwa herdu pev re îlhamî ruhê wî kiriye. Ji ber vê yekê ye ku carna dibe eşrefê mexlûqatan, carna jî dibe zalim û nankor.

Han ev mirov, him dikare bibe dilsozê gelê xwe, him jî dikari bibe xayinê gelê xwe.

Li gor min, esasê pirsgirêkê di vê nuqtê de ye. Li hemû deverên dinyayê îro qerqeseya vî tiştî tete jiyîn. Di vê gava dîrokê de, ya ku em lê dijîn, miletê kufre li pîr deverên dinyayê serwer e. Hêzên şer, heqşinasan xistine binê nîr û wan diperçiqîn û ji aliyêkî jî, xwarinên ku miletê kufre bi fitneyê meyanandî ye, bi wan dide xwarin. Çi xemnak e ku mazlûmên Miletê Îslamê, carna bi darê zorê, carna bi dek û dolava, carna jî, ji bêçariyê van xwarinana dadiqurtînin.

Ev xwarinên jehrdar çi nin? Bi koma, hejmara wan heye: a) Netewên Yekbûyî, b) Nijadperistî, c) Mafên Mirov, d) Plankirina Nifûsê, e) Pirsgirêka Jin f) Demokrasî g) Laîqtî f) û pariyê dawî, yê herî jehrdar: Sazumana Nû ya Gerdûn. Lihevanîneke ku jê re tê gotin: Ji nû de avakirin, yanî utopya ya Dewleta Cîhanê.

Li gor min, ev pirsgirêkên sînî, feq û dolavên miletê kufre ye ku dixwaze bi wan, mirovatîyê bavêje kortalên tarî.

Di vê nuqtê de, kare bête pirsîn: Gelo di navbera miletê me de, yanî Miletê

Îslamê de ti carî wê îxtîlaf neyên meydane? Wê ev îxtîlaf çawa çareser bibin?

Heger ko wekîlekî jîndar, fermandar û hêzdar, yê otorîta Miletê Îslamê hebûya, bersîva vê pirsê hêsan bû. Lê gava ku otorîteke wisa tinebe, tengasî û janên giran dertên. Li navenda ku hevpariya otorîta cîhanî tinebe; hemû neferên misilman, yanî neferên Miletê Îslamê, li ser wan ferz-î 'eyn e ku li hember Xwedê mesûliyeta xwe pêk bînin. Ev tişt, rewşeke mehşerî ye ku li vê dinyayê tete jiyîn. Herkes li çara serê xwe dinêre û çavên tikesî kesî nabîne. Kesê xurt, bi serê xwe bi tenê, mîadekî dirêj dikare berxwedanê bidomîne. Lê kesên ku kêmqewet bin, di binî de dimînin û dipelçiqîn. Ev navênda tevliheviyê ye; navendeke bi keşmekeş û zîlet e ku Xwedê berê xwe jê guheriye û layiqî mirovan e.

Îcar, di navendeke wisa ku bi pirranî endamê Miletê Îslamê, yek bi yek vê zîletê dijîn, di vê guftûgoya kerr û kora de, pîrsek ji min hatiye kirin, pîrsek ji dil û dostane: Derbarê "Pirsgirêka Kurdan" de ray û ramana we çi ye? Ji bona ev pirsgirêk bête çareserkirin, pêşniyarên we çi ne?.. Ko hun di şuna min de bûna, di rewnaqa van ray û baweriyên ku li jor hatiye gotin, we yê çi bersîv bidana?

Ya rast, agir dora xwe dişewitîne. Bi-rayên min î mu'min, nazikî kirine ku min

jî hemberê vê pirsgirêkê girtin e. Ez ji dil bawer im ku, hinek jan û pirsgirêken wan henin. Lêbelê, heta ku em (Miletê Îslamê) nebin otorîte, ev kul û pirsgirêkana, di nav kul û pirsgirêken misilmanan yên gelemperî de, mahkûmên herêmiyê ne û em nikarin wan bikin pirsgirêka gelemperî. Herçi ev jan û pirsgirêkanan (yên kurdan- W.) kokên wan yên dîrokî hebin jî, pirsgirêkên misilmanan jî yên ewqasî muhîm û xwedî kokên dîrokî henîn ku, bi ser de em wan ji xwe re doktrîn qebûl dikin. Ez hêvî dikim ku Xwedê hesabê wan ji me neke. Heger ko hesabê wan ji me bike, ez tirsê dikim ku aqîbeta me agir be.

Ez mirovekî ku di nav bavpîr û dapîrên wî de kurd, tirk, ereb û abalin ji ermenîtiyê henin û bavê min ji begên Dêrsimê; diya min jî, bajariyeke Xarpûtê ye. Zimanê diya min tirkî ye. Îcar ka çi ji min tê xwestin ku ez bikim? Bi çi awayî, xwe bi tenê berpirsiyar bigrim. Tirk û erebên ku di malbata min de geriyanin, heger ku di dîrokê de ji lingên xwe re cihêk bidest anîbin û kurdan ev cih bidest neanîbin, di vê nuqtê de mesûliyet û gunehên min çi ne? Ya rast, ez ti bersivê ji vê re nikarim peyda bikim.

Bi ser de, heger mirovek, civakek, nijadek û axir miletek, ku di çi rewşê de be, ez bawerê vê me ku, ji bandûrên derveyî pirrtir, bi destên xwe, xwe ê xistine wê rewşê. Di fikra min de, medeniyetek, yan jî miletek û axir ummetek, bi kirin û nekirina xwe, digihêje musteheqê xwe. Nîhayet ez bawer im ku îro zîleta ku tirk û ereb û kurd tê de ne, ji ber ku ew bi xwe layiqî wê ne, tê de ne.

Dibe ku di vê zîletê de, kurd, ji tirk û ereban hê li jêrtir mabin û ji wan bêhtir astengî û jan kişandibin. Lêbelê rêya rizgariyê, ne ku merev ji navbera pirsgirêkan tenê pirsgirêkekê bibîne û jê re çarenan peyda. Li gor min, tirk, kurd, ereb, fars û hwd divê ku em hemû pev re, ji vê kirinê ya jî nekirinê, ji vê ramanê ya ji bêramaniyê, ku em kirine musteheqê vê zîletê, xwe dawêşin û em xwe bi boyaxa Xwedê, boyax bikin û

hişk bi werîsê Wî bigrin. Di rêberiya resûlê Wî de, dest bi berxwedanekê bikin ku layiqê nefertî ya jî civaktiya Miletê Îslamê be. Ez ji vê pê ve ti rêya çaredar nizanîm û nabînim.

Li derê vana hemûyan jî, di seranserê dîrokê de, xespkirina mafên kurda, qedexeya mabûna xwendin û nivîsandina zimanê wan... Li gor min di navbera pirsgirêkên mezin û eslî de, ev arezûyana di çarçûvekê teng û herêmî de dimînin.

We kî din jî, ko kurd, di bin ala xwe de, li ser axa xwe azad bijin... dibîstanan damezirînin û zimanê xwe bir serbestî bipeyivin... Di çarçûva pevçûna heq-batîl de, kîjan pirsgirêk wê bê çareserkerin? Wê gavê civaka kurd wê li pey mensûbiyeta Miletê Îslamê be an miletê kufrê be? Kurdên rafizî yên Dêrsimê, wê xwe mensûbê Miletê Îslamê qebûl bikin? Ya kurdên sosyalîst, ku di vê dema me de têkoşîna kurdan bi rengê politîk dajon û seroktîya wê dikin, gelo vana wê mensûbiyeta kîja miletî biçêtirînin? Ma gelê kurd jî, mîna tirk û ereb û ecem û misilmanên Hind mêmî, wê ji nû de di navbera têkoşîna îdeolojîyê, û mensûbiyeta eslî de bimînin?

Naxwe, ji bona îdeal û îmajê Dewleta Cîhanî ya Îslamê, em hemû misilman, bi jîndehiştina fikra endametiya Miletê Îslamê, bi zimanê hal û bi zimanê maka xwe, ji bo ku miletê me, li ser miletê kufrê serwer bibe, em di lazîmî û hewcedariya têkoşinê de ne. Li gor ku dizanîm, li her du cîhanan, rizgarî ji vê rêyê pê ve, bi awakî din berdest nabe.

Di vê mewzûyê de ya dawî, gotina xwe ya dawî dixwazim bibêjim: Ez hêvî û wasiyet dikim ku li kîjan deverên cîhanê be jî, ji dêvla muamela tirkîtiyê, muamela mirovetiyê û misilmantiyê, ji dêvla mensûbiyeta tirkîtiyê û nijadê dinê ku di nîjada min de geriyane bêhtir, dixwazim ku mensûbekî Miletê Îslamê bême naskirin û ji ber ku ez di cehda jiyane misilmankî de me jî definkirineke misilmankî dixwazim.

*Ji Tirkî: Raserîn Baravî*

# DIMILÎ BIWAN DIMILÎ BINÛS

M. Said Avcı

Însanî di morê qederî zıwan o. Zıwan morê biyayen û jubiyayenê Ellah Teala yo. Zıwan, sen'etê Ellah yo xeylê ecîb o. Ellah Teala qandê/seba tayn hîkmeta hergi mîlet rê jew/yew zıwan da yo/da wo. Heger zıwan ra esil meqsed piyaûmişê însana tenya biyayê, heme însana rê jew zıwan bes bi. Hima ma yê vînenê ki, dinya di hezarana zıwanî estê. Hergi mîlet rê jew zıwan kewno. Ney ra ma fam kenê ki, zıwanî ra meqsed tenya ûmiş-biyayena însana niyo. Winî yo se, zewbî çî hîkmetê zıwanî estê?

Ellah Teala Qur'an-û Kerîm di nê hîkmetan zaf ayetan di vano. Ninan ra ju ayeti na ya:

"Xulqkerdena erd û azminî, cabiyayena zıwanan û renganê şima delîl (biyayen û jubiyayen)ê Homa yê."

Na ayet ra zî yeno famkerden ki, zıwanî ayet (delîl) ê Homa yê. Qandê coy (seba ci) merdim zıwanê ya înkâr yan zî qedex bikero, ze ki ayetên da Homa yi înkâr/yasax kero. No, însanî heta kufrî zî beno.

\*\*\*

Ewro dinya di mileta bê zıwan çini ya. Yan zî zıwano ki nêwaneyêno û nênûşyêno hima hima nêmemo. Hima, hewawo ki ez zana heta nê serrandê peyinan hema hema bi zıwandê ma ya çî yê nê ameyo nûştîş. Zalima heta nê serrandê peyinan zıwanê ma wo/ma yo delal û şîrin kerdî bi qedex. Zaliman û gunîweran nêverdayê ma zıwandê xuyê şîrin û delali ya binûsê û biwanê, film û tiyatroy vîrazê, televizyonî û radyoy goştarey bikerê. Fina zî Homa yi rê zaf şukur ki -çendi vêşî nê bê zî- nê çendi serranê peyinan di tayn kovar û rojnamey zıwandê ma ya vijiyay. Nê kovar û rojnamandê Kurdan di Dimilkî zî amê nûştîş.

\*\*\*

Ma ney rind/weş bizanê ki problemê mileta ma çendi vêşî, ê/yê zıwanê ma zî hendi vêşî. Senî ma wazenê mileta ma aver şiro û zey miletanê bînan bibo azad, gerek/ganî ma averşiyayen û azadbiyayen a zıwanê xu zî biwazê.

Ma senî wazenê mileta ma cay xu miyan dê miletanê azadan di bigîro lazim o ki ma biwazê zıwanê ma zî, zıwanê edebiyananê bînan miyan di cay xu bigîro. Seba ney zî, xeylê xebat û lebat lazima.

Verê heme çî, gerek her kurd bizano ki "Xurteya zıwanî pabestey xurtey yan zî hêze-ya mîlet a" Qandê coy, lazimo ki her kes xu het ra seba xurtey û zelale ya zıwanê ma, raşt-zanayen û raşt-nûşnayen û averşiyayena zıwanê ma bigurweyo/bixeftiyo. Na wezîfe ya ma ya milî/netewî ya.

Mî cordi zî va; nuştîşê Dimilî newe yo. Co- ra zî derd û qehrê Dimilî heme hetan ra vêşî yê. Fina ez weş zana ki, zıwandê ma ya, meqaley, romanî, istanikî, helbestî, meseley, tiyatroy zaf nênûsiya yê. Xura Dimilî zemandê verî ra heta ewro tim û tim binûsiyayê û biameyê wendiş halê zıwandê ma, do ewro ra zaf zaf/vêşî vêşî rindir û hewlêr biyayê. Hema, ewro ma dest di folklorên do xeylê zengîn esto. Her çiqas no folklor nêameyo nûştîş zî, keye ra keye, dew ra dew, sûk ra sûk, fek ra fek zemandê verî ra heta ewro resa yo ma. Ganî ma qîmetê nê folklorî bizanê û qandê averşiyayen û zelalbiyaşê zıwanê xu bixeftiyê.

Folklor xezîna û zengîneya zıwanî ya. Na xezîna ser o zıwan roj bi roj virazyeno, aver şino, xelfe dano, weş û geş beno û verra verra zıwananê edebiyananê bînan miyan di cay xu gêno. Seba ney/qandê coy averşiyayenda zıwanî di rolê folklorî zaf muhîm a.

Ez bawer kena ki, embazê ki wazenê Dimilî bimûsê, binûsê û biwanê çendi mengî (aşmî) bixeftiyê bes o. Gerek/ganî ma -çendi zehmet bo zî- hîrê çihar aşmî Dimilkî sero bigurweyê yanî Dimilîya biwanê û binûsê.

Ma ki wazenê zıwanê ma zey/hezey ê/yê şarî zelal bo û aver şiro ganî/gerek bêguman ma vêşî/zaf bixeftiyê. Çunkî zıwanê şarî, şarî rê çend weş û şîrin o ê/yê ma zî hendi/ehendi weş o, hendi şîrin o û hendi erjiyaye yo. □

# TI ZEY MA NÊBENÊ MA YA MEYI

M. Kemaleddin Beşiran

**R**aya ki mayê po şinê bi zehmet a kulfet a û ezîyat a. Na ray raya "Tewhîd"iya. Heger sebr û tehamül û ezmê to esto, qelbdê to di "Lailahe illallah" hukumfermayo bêri! Winî niyo meyi!

Ti şenê derbetî, qehrî û zilmî qandê Homay bancê xo sêne û destan, xo verşanê bê. Nêşenê meyi!

Na ray qandê nefsî nî ya. Na ray raya kar û qezencî niya. Ma nêşenê rojmeh (yome) ê to bidê. Heger ti do bêmenfeet nêgirweyê se meyi!

Merdimêki qandê nam û iqbalî û şarî mîyandê girdbîyayîşî girweyênê. Heqî vero jî werdikewtişîrê xem nêkenê. Ma bînanana lejê! Tî nîna wazanê se meyi! Nêwazenê se bê!

Ma çiçi vînenê ey wenê û vila kenê. Çiyê nêvînenê, sebr û şukur kenê. Heger ti bi werd û zad û tamweşey geyrenê, vêredê xurê hergi roj roşan kenê, salnan da madi no çi çiniyo. Ma miyandi to rê ca çiniyo. Ma miyan mekewi! Yan jî tewrdê mabi!

Werd u şimitiş u xoradayiş dê helal u ercanîrê razîyêse bê! Mayê: Paye u keyf u rehatay dima nêgeyrenê! Apardumanê mayê asmaranî (asansîr) u odayê mayê qoltixlî jî çinîyê! Ti do zimistanî germî vera, amnanî jî honikî vera nê werzêse cilda gelmu u hesîrî sero ronîştîşya rihateya to şehtêna se mekew ma miyan!

Ma hor vîneyênê u kutbeyênê u kaşbeyênê. Jewfin jî şelpax wenê. Ma erzênê zîndanî zî. Dinyawîyan hetî îtibarê ma jî çiniyo. Ger tu îtibar u şohret zûrkeran hetî wazenê se meyi! Nêwazenê se bê!

Ti do qandê koxtikê faydi hendê kilmikê bînameyê se. Imandê xûra tawîz bidê u bawerdê xûra sistbêse meyi me hetî! Yanjî bê! Werdo bol û qise û hiwatiştê zaf û hewndo vêşî ra heskenê se ma het no çi çiniyo. Hesret manenê! Ma miyan di ti nîna nevînenê! Nêwazenêse bê!

Kar û xebatê to qandê serokey û serdoreyo se, mekewi erdê ma miyan. Ma di: Serokey

nîna waştên, bideyo se gêrêna. Razî benê bê! Yan zî meyi! Yanji Nê!

Ti merdimêndo bêxeta û bêqusûr û bêgunayêse maya meyi! Bi ma piya me! Ma qûlê eciz û purqusûr û gunehkarê. Hema huzur dê Allah vero tobedarê. Ti şorî, xurê zeydê xo masûmî bivîni! To nêdî se bê!

Deryaşina xu ma veşnê royan vero. Ti raya peydageyrayişî pawenê se meyi! Yan jî gemiya xu biveşn dima bê! Dukandê macî kar û zerrar quruşa niyo. Peymitiş û setiş bimetroy û kîloya niyo. Yan tim karêndo bidûmo. Yanjî zerrarêndo girdo. Ti biquruş û metro û kîloyana ê peymitişiyê se meyi! Yan zî verdi bêri!

Tido maya bêrê se; Ey way û bira! Zeydê merdiman bê! Biaqil û qelb û rih û bedena zey merdiman nîne se meyi! Sifte ra meyi!

Rind goştareya mi biki û remambi ê ki ray ra ageyrenê xayinê. Dima yenê kiştîş. Yenê zî bêri! Bê! □

## NO KAMCÎN DEWR O

Teyrê wesarî bêveng mend î  
Koyandê Kurdistanî ser o  
Berîvan nêşna bêri tiya di  
Yarebbî! No kamcîn dewr o?

Gulîstan di vilî nêabyay  
Merdimî bēnan û bêaw mend î  
Qîrîna qeçan resê azmîn  
Yarebbî! No kamcîn dewr o?

Tifingan dê gunîwerdan ra  
Nafin jî gûni ya ma rijyêna  
No çi zilm o vareno ma ser  
Yarebbî! No kamcîn dewr o?

Qabirxey ma biyê pênûsî  
Destan dê zaliman di ancî  
Gunya ma murekebê ci yo  
Yarebbî! No kamcîn dewr o?

Dinyay no zilm nêdiyo  
Bindestey çiçi ya ma vînenê  
Ey Homa! Mîlet pêro hewn da  
Yarebbî! No kamcîn dewr o!

Wedat ê Bedirxanî

# PÛTÊN BÊXÊR Û BÊKÊR

Xelîl Amed

Zarokên hêja û rind; di vê nivîsarê de em ê ji we re behsa serboriyeye sehabiyekî bikin. Ew sehabî bi navê xwe, Eba Zer ê Xifarî ye. Eba Zer (Xwedê jê razî be), rojekî li cem hinek pûtperestên ji merivên xwe rûniştî bû. Ji wan muşrikan her yek pesn û sî-tayîşa pûtên xwe didan. Îcar dor têt Eba Zer. Divêt ew jî pesnê pûtê xwe bide. Eba Zer hinekî difikire, şilika hustiyê xwe dixurîne, nav porê xwe dixilîne... demek şûnve fikrek bibêjim ku, bila ev civat hemû bêkêrî û bêxêriya pûtan bizanibin û bila dev ji vê pûtperestiyê berdin. Wilo dest bi xeberdana xwe dike:

"Gelî hevalan! Ev hefteyek berê, ji bo peresdariyê ez çûm bal pûtê xwe. Min bi xwe re kodikek şîr jî bir. Da ku ez xelatê pûtê xwe (yanê Xwedayê xwe) bikim. Ez gehîştim hinda pûtê xwe, min jê re bi rûmet secde kir, gazin û lavayên xwe pêşkeşî wî kir û ji cem wî cida bûm. Qasê bîst an sîh gav hebû ku ez jê dûrketi bûm; min xwest gelo pûtê min xelata min pejrand an nepejrand, ez bibînim. Zivirîm û lê nêhertim.. Hey wax! çi bibînim? Kuçikêkî wek berazekî, hatiye cem pûtê min û serê xwe kiriyê nava kodika şîr, şelpe şelp bi dev ketiye, wî şîrî vedixwe. Eman û hevar, ev çi xezebe! Wê ev kuçika hemen di cîh de hişkolekî bibe. Kuçik şîr qedand, serê xwe ji kodikê derxist, li dora xwe mêzekir, dumahî re zimanê xwe derxist û dorhêla devê xwe dalêsand. Min xwe di paş quçekîk de veşartibû û metelmayî rewşa kuçik difericand. Lê kuçik ev kirinên xwe bes nedibû. Min nêhert ku, îcar lingekî xwe yê paşin hilda û mîza xwe bera ser pûtê min da. Pûtê min wek baran serda barî be, şil û pil bû. Ji eyb û şerman, min çavê xwe girtin, serê xwe nizmand û li xwe xist. Ev çawa dibe? Çi-

ma ti têkileyek ji alî pût çênebû? Tew nebe çima xwe ji wê mîza genî neparast? Ez gelekî hêzîrîm (fikirîm). Dawiyê re min wilo biryara xwe da: "Ji vir (anka) pê ve, min ji va putên bêxêr û bêkêr re perestûşî nekir." gotim, dumahî min hêrîş da ser vî xwedayê sexte; ji erdê hilda û li zinarekî (bi hemû rik û qehra xwe) da, perçe kir, ez jê filitîm; min ji vê bûyerê şun de baweriya xwe bi aferandoxê erd û azman anî, ez ketim nav çerçova Îslamiyê. Hevalnon, hun dibînin ku ez jî saxlem im, lewra vî rebbê sextê bi min jî tiştê nekir.

Belê, derheqê pûtan de gotinên min ewqas e, de kanê hun çi dibêjin, bîryara (qerar) xwe bidin!"

Dawiya van xeberdanên Eba Zer, ji merivên wî gelek baweriya şîrk û pûtperestiyê berda, bi bîr û baweriya Îslamê ve xwe girêdan; serfirazê dinya û axîretê bûn. Kabîk û zencîrên bindestî û koletiya pûtperestiyê

hilqetandin, bi ebdiitiya Xwedayê Mezin serbilind û serbest bûn. Lêhema ji wan merivên wî, hinekên hindik jî di kufra xwe ya berê de îsrar kirin, hefsarê xwe dîsa dan destên put û sazumanên pûtperist.

Zarokên delal! Ez hêvî dikim ku ev serboriya Eba Zer, wê gelek ji me re îbretamîz be. Lewra ev bûyerên hatibû

serê pûtê Eba Zer, di vî welatê ku ji pûtan derbasî nabe, gelek caran em jî bi çavên xwe dibînin ku li serê van senemên Lawê Zibîdê jî diqewimin. Çûçîk, kevok, reqel, yekcarna kuçik û çeçel, hetta yekcarna ji dostên wan ên ecnebî jî, geh rîç, gel bi sila guhên xwe ser ve derfîn, timî dilewitînin. Hîn de gemarpaqijên belediyên bajaran jî, ji vê rewşê eciz bûnin...

Ev nivîsar jî bila xelatê pûtperestên hemdemiyên şareza (!) be. □



# HZ. HEWWA Ū GERDŪN

Mihrican Doğan

**D**îroka mirovantiyê, bi Hz. Adem dest pê kiriye.

Hz. Adem û pêy wî jî Hz. Hewwa xulîqiye.

Xwedê Teala di Qur'ana Kerîm de dibêje ku: "...Ez ê li ser rûyê zemîn xelîfakî bixulîqînim."

Sifata mirov, ewil xelîfetî ye. Ji wî hawî ye ku Xwedê ezze we cel, negotiye "...Ez ê mirovekî bixulîqînim", lê gotiye: "...Ez ê xelîfakî bixulîqînim." Ū xelîfeyê ewil xulîqand: Hz. Adem... Mirovê ewil û pêxemberê ewil...

Qiseya Adem (s) di Qur'anê de bi tabloyên bizav û rayda hatiye teswîrkirin.

Xulîqandina mirovê ewil (E'raf: 11), hîn bûna navan (Beqere: 31), secdekirina melekan (Hîcr: 30), îsyana şeytên (Hîcr: 31), qewirandina şeytên (E'raf: 13), jiyana Hz. Adem û Hz. Hewwa di bihiştê de (Beqere: 35), xwarina mêweyên qedexe (E'raf: 22), ji bihiştê deranîna wan û gerdûn (E'raf: 25).

Han, hikaye (:çîrok) ji vir dest pê kiriye.

Qada îmtîlhana wan hatiye hilbijartin... Êdî herdu însan wê li gerdûnê bijin. Pêşî, wê hesabê kirinên xwe bidin Xwedayê xwe.

Gerdûn... Qada îmtîlhana Adem û Hewwa:

"... Tê de bijin û tê de bimirin û hûn ê ji wê bîne derxistin " (E'raf: 25)

Êdî wezîfa xelîfetiye dest pê kiriye.

"Me emanet pêşkêşî ezmanan û erd û ciyan kir, ji hilgirtinê tirsîyan û xwe jê vegirtin. Benî Adem ew hilgirt." (Ehzab: 72)

Ji ber vê rûmetê ye ku ji mirov re, melek secde kirin .

Êdî mirov û îrada xwe serbiser e.

"Ew e yê ku we kiriye xelîfê rûyê zemîn û di dana tîştan de, ji bona we pê biceribîne, dereca binekên we di ser ya hineka re girtiye." (En'am: 165).

Mirovê ku xelîfetiya serzemîn hilgirtiye,

helbet îcaba vê wezîfê ye ku bûye wekilê avakirin û îslahkirin û tethîqkirina hukmên Xwedê.

Berdevkê vê wezîfeya birûmet yê ewil Hz. Adem e. Ū di pê wî re Hz. Hewwa hate xulîqandin. Ev wezîfa giran li ser milê her du însanan par bûye.

Dawî, ev mîrasa birûmet, mirova dewrî hevûdu kirine ku encax mîrên mu'min û jinên mu'min weliyên hevûdu ne.

Hz. Hewwa di şanoya gerdûnê de cihê xwe bi şiklê dayêktiye girtiye û mîrasa xelîfetiye ji nesla paşîya xwe re bi liyaqatî ev emanet hiştiye.

Yên ku ji bihişt -ji cihê rehet- bi gerdûnê hatin xarê, yek ji wan jî jin bû.

Îro jin di bin hakimiyeta taxûtî de mesûliyeta xelîfetiye jibîr kiriye. Ū ji rêya meqseda xulîqandinê derketiye.

Hal ev e ku xelîfetiya we, ji bona serweriya edaletê û berxwedana li dijê zordariyê û piştvanîya mazlûman û ji bo rakirina fitne û fesadiyê û ji bo hildana kelimetullah, cîhadkirin e.

Pişt re, welayetiya mîr û jin yê mu'min (Tewbe: 71); xulîqandina ewil (Hucûrat: 13) kirin û fîrotina bi Xwedê re (Tewbe: 111), biratî (Hucûrat:10), îcabetkirina dua

(Mû'min: 60), efûbûn, berpîrsiyarî û hilgirtina emanet (Ehzab: 72-73) ji bo ketina bihiştê, (Tewbe: 72) Yek keç, yek xwendekar, yek bûk, yek dê, yek mamoste, yek serkar (Neml: 23) yek şexsiyetek berpîrsiyar e.

Ji bihiştê bi hatina gerdûnê re, mirov di vê rêya dirêj de, li hember Xwedê bi mesûliyet û xelîfetiya xwe haydar bû. Ji ber vê yekê divê ku li dinyayê jî dîsa mêldariya şeytên neke û pê nexape. Ji bona ku cara duduyan cenetê heq bike, divê ku bi şewq û hevî, têkoşinê bîdomîne. □



## Ferqa leşkerê Romî û leşkere Sirba çi ye?

Bismillahirrehmanirrehîm.

Birayên malbata Nûbihar,

Serê peyvê, selama Xweda û bereketa Îslamê li ser we be û li ser me be jî.

We berga hejmara pêncemîn Pirsgirêka Bosna daniye û we li ser Bosna wezîfa xwe ya mezher ji vê gotina peyxember ve...“ Kî ko sibê lê bibê û derdê mislimanan ji xwe re neke derd, ne ji mislimana ye...”

We wezîfa xwe pêk anî. Birayên delal, pirsgirêka me û gelê Boşnaq gellek dişibihe hev. Lewra ez ne şaş bim, ya kovara “Imza” ya jî “Yeryüzü” bû, bi serokê gelê Bosna Elî Izzet Begovîç re hevpeyvînek tertîb kiribû Ev hevpeyvîn berî nuha bi salek, an – sal û nîvekê çêbibû. Di wê hevpeyvîne de Elî Izzet Begovîç weha digot: “Çawa ku dewleta Tirkî li gelê Kurd zilmê dike aynên weha dewleta Yugoslavya jî zilmê li me dike...” Ew kovara mislimanan piştî vê hevpeyvîna bi Elî Izzet Begovîç re, notek weha nivîsî bû: “Ji ber hebûna maddeyên 141 û 142’an, ev qismê hevpeyvîna Elî Izzet Begovîç em nikarin biweşînin.”

Belê birayên delal, wê rojê min guhdariya peyvîn - axaftinê radyoya Tirkî dikir weha digot: “Filan bajarokê mislimanan kete destê leşkerê Sirb û mirovê ku ji bajêr direvin jî leşkerên Sirb wan dikujin...”

Di vê hêngamê de dîroka gelê Kurd hate bîra min. Piştî serhildana Şex Seîd (r.a.) bûyereka weha çêdibe: Pîrejinek ji gundekî Licê -ku navê gund Girêdadim e- weha dibêje: “Roj li avabûnê bû û sanciya zayînê ez girtim. Di wê hêngamê de li nava gund peyveka belav bû. Leşkerê romî gundan dişewitînin û va ye hatine gundê me jî. Roj çûbû ava û gel ji gund deriyân. Di wê hêngavê de zaroka min çêbû. Min heman wê dinav potiknan de pêçand û danî û mekebê bi ser de dakir.

Li hêleke gund xanî dişewitî, bi wî halê xwe ez ji hêla din reviyam û min xwe di nava mêşekî de veşart. Piştî sê rojan ku em veşeriyam gund, me dît ku sêzdeh mirov hatine kuştin.”

Belê birayên delal, ferqa leşkerê Romî û leşkere Sirba çi ye? Çawa ku we xweş nivîsandî ye: “Zalim yek millet in, mazlûm yek millet”.

Bi umêda serfiraziya gelê bindest, bi destûra îslamê.

Selamê Xwedê ser tevî bindestan.

Şikrullah Yildiz

## Negrî Heval

Negrî heval. Dilopek hestirên çavên te heye, wê yekê jî heba neke. Ez dizanim ku girî di qêdera me de heye. Divê em bikşînin. Sebrê bike. Te hewdî rojekê, ken bibe nesîbê me jî.

Mervê hemdem, bi me re bi awayekî demêder xebat dikin. Berî nuha bi çardeh sedsalî, koletî winda bûbû. Lakin ne li alî me. Lewra bavên kalê te berî çend sedsalî bûbû kole. Ji kole, kole derdikeve.

Azadî çi ye, kare çi bike? Azadî û koletî, mîna agir û avê. Ma dibin hevalê hevdu?

Negrî heval. Tê hê zehf bigrî. Hêdî, tu piçekî din jî mezin bibe û bibîne. Binêre, bavê te di karê xelkê de perekêta dişkîne. Diya te, di zeviyên axayê te de koletiyê dike. Eger xebata wan ji bo axayê te tinebe, ji te re xwarin jî tine ye. Jiyana te û jiyana wan bi pariyekî nan ve girêdayî ye. Ji bona loqmeyekî, keda rojekê.

Tu hê çima digrî? Bisekine û mezin bibe. Mezin bibe da ku tu ji bona axayê xwe xebat bikî.

Tê bîra te? Axayê te ji bo te çi digot? Evaya hezar sale ti ji bo wî xulamtiyê diki! Axa, axayê bavê kalê te û yê bavê te û te ye, ev hezar sal e ku we xwedî dike. Yanî ev hezar sal e ku tu bûyî bar, ser milê wî.

Hee! Tu dibêji dema ku ez hatibûm dinyayê ez azad bûm. Ez tenê ebdê Xwedê bûm. Ne bêje. Lewra mefhûma Xwedê di kitêba wî de tine ye. Xwedayê wî tine ye. Xweda, nav axa wî de çi dike?

Te Fir’ewn bihisti ye? Te dît çawa digot: “Ev axa Misrê ne ya min e? Ev qesr û xezîna ne yê min in? Ji ber vê yekê ez xwedayê we me? Eger hun ji bo min îbadet nekin, ezê mêrê we bikujim, jinên we bêşerm bihêlim.”

Tu zanibe ku Fir’ewn ne şexsek e, sifetek e. Tu deynî rex kîjan navî de dimîne pê ve. Ev zalim û Fir’ewnên îro, bi Fir’ewnên doh, pîramîdan didin kişandin.

Negrî heval, çi ferqa wan û Nemrûd heye? Yên ku Ellah dibêje dikuje, yê ku azadiyê dixwaze, dipêje. Mîsala Fir’ewn û Nemrûdan mîna beqê ye. Behr rûyê wan şil nake. Çaxê ti tîkî rûyê wan, dibêjin baran dibare.

Negrî heval. Hêstirê çavên te bibin mîna Nîl, wê hê pê kêfxweş bibin. Lewra hêstirên te dibê ku biçê axa Misrê ya jî çola Sînayê av bide. Daxwaza wî zaten giriyaandin e. Negrî heval. Da ku hêstirên çavê te nebin lehî. Wexta ku baran û lehî çênebin wê axa wî hişk bibe. Dema axa wî hişk bibe, te hewdî ku bela xwe ji Rebbê Banî bibîne.

Omer Saqî Avdilla

## Nûbihar weke kulîkekê, biharê mizgîn dike

Birayên min; min divê ez vê bêjim: Zilma dijminê pîs bila me ne tirsîne. Lewra çawa ku mirina zordest û xwinxwarên berya vana hat, wê mirina vana jî were û hatiye. Nêzik û zehf nêzik. Wextî roj derkeve.

Derketina kovara me Nûbihar, mizgînyek e ji me re. Weke ku kulîkek dibe mizgîniya hatina biharê.

Heye hûn bibêjin ma gelo bihar bi kulîkekê tenê têt? Ez dibêjim belê, têt. Ma mizgîniya bihara Îslamê ne bi gulekê (pêxemberê me Muhemmed (s.) tenê hat? Naxwe, pîr xebat, yekîti û desthevgirtin...

Û xwedî derketin li kovara me Nûbihar.

**Selîm Bayram**

## Lazime ev werê zanîn, ko şerîet jî hakim be, dîsa Kurdistan wê hebe

Min divê ez çend gotina ser pîrsgirêka me Kurdan bibêjim. Lewra wextê ku ev pîrsgirêk tê holê gellek pîrsiyar tiştên girîng kêr dihêlin û hebûna tiştên tê redkirin.

Çawa?

Tête zanîn pîrsgirêka me pîrsgirêka umetê ye. Ma derdê hinek mislimanan ne derdê tevî mislimana ye? Di gotinan de hel û fesilkirina pîrsgirêka me bihêsanî çê dibe. Zemanê ku tê helkirina birastî, hinek pîrsiyar (bi taybetî pîrsiyarên misilmanê Tirk) bi ray û ramanê umetî (wek Îslamê) nêzikî vê pîrsgirêka birayên xwe yên Kurd nabin. Ev tişteke zehf girîng e û tişteke pîr ecêb e. Çi biratî û çi hal.

Ha, dibêjin: Em misliman, birayê hev in weke hev in. Ê, çî dî? Dewleta me jî dewleta Tirkî ye. Û zimanê me jî Tirkî û ev welat tev yek e. Yanê navê welat Tirkistan. Lazime sinorê Milî Mîsaq hebe, bijî. Vê nizanin. Ji wan weye ku Îslam berî Kurdû Kurdistanê ye. Çima ti Tirk û Tirkistan qebûl dike, lêbelê Kurdistanê qebûl nake?

Lazime ev werê zanîn, ko şerîet jî hakim be, dîsa Kurdistan wê hebe. Ji xwe ev heqê ha Xwedê daye me. Ma kî karê ji me bistîne?

Heger ev xap bin, xap bes in. Lewra em têra xwe hatine xapandin. Naxwe biratiya vira bes e. Êdî vê rastiyê neveşêrin.

**Ebdillah Melefî**

## Zanîna zimanê me, armanca hemû xwendevanên Nûbihar e û ev armanca, armancek pîroz e

Bi navê Xweda yê arîkarîxwaz û bimerhemet.

Gelî karbidestên Nûbihar, ji we re gellek spas dikim.

We bi derxistina Nûbihar, em pîr kefxweş kirin. Kovara ku we derxistiye li gelê Kurd pîroz be!

Di her rindiyê de Xwedê alîkarê we be. Ev çend sedsalin zimanê Kurdan hatibû qedexekirin. Me pîrî zimanê xwe ji bîra kiri bû. Zimanê me hatibû asimîlekirin. Lê Nûbihar ev tarîtiya li ser me bû, kir ronahî û di vî alî de, em hêvidar kirin.

Zanîna zimanê me, armanca hemû xwendevanên Nûbihar e û ev armanca, armancek pîroz e.

Aniha ez ê ji we çend tiştan bixwazim: Ez qaîl im ku hun di kovara Nûbihar de hinekî jî, ji tarîxa me binivîsin. Kalîkên me, bi me bidin naskirin. Daxwaza min a din jî ev e; Hun ferhenga ku di kovara Nûbihar de ye, hinekî zêde bikin, dê pîr baş be.

Xweda ji hemû nivîskar û karbidestê Nûbihar û ji hemû mûmînan razî be.

**Muhemmed Elî ULU**


**Aborî:** İktisadi, mali, ge-  
çimsel  
**Alav:** Ateş alevi  
**Afirandin:** Yaratmak  
**Astan:** Satürn Gezegeni  
**Astengî:** Engel, mani, sıkıntı  
**Axaftin:** Konuşma, hitab  
**Bakur:** Kuzey  
**Bandûr:** Etki, tesir  
**Başur:** Güney  
**Belam:** Fakat, ama  
**Beramber:** Karşılık  
**Berhem:** Eser  
**Berpê:** Tepki, reaksiyon  
**Bersûc:** Sanık, suçlu  
**Bêdengî:** Sessizlik, suskun-  
luk  
**Bi dest anîn:** Elde etmek  
**Biryar:** Karar  
**Biyânî:** Yabancı  
**Bizav:** Canlı  
**Bûyer:** Olay  
**Calib:** Çekici  
**Civak:** Toplum  
**Civaknasî:** Toplumbilim  
**Cûda:** Ayrı  
**Çareserkirin:** Çözmek, hal-  
letmek  
**Çeleng:** Yakışıklı, ihtişamlı  
**Çeng:** Harp (çalgi aleti)  
**Çêtirandin:** Yeğlemek, ter-  
cih etmek  
**Çiqil:** Dal, tutamak  
**Ço:** Sopa, değnek  
**Danûstandin:** Alışveriş,  
münasebet  
**Demdemî:** Geçici  
**Derber xwe girtin:** Kapsa-  
mak, içermek  
**Destpêk:** Giriş  
**Devok:** Şive  
**Digerxem:** Diğergam  
**Dilgeşî:** Mutluluk, sevinç  
**Dîrok:** Tarih  
**Domandin:** Sürdürmek  
**Duyem:** İkinci  
**Evîn:** Aşk, sevgi  
**Gel:** Ulus  
**Gelemperî:** Genel, umumi  
**Gelemperîbûn:** Toplum-  
sallaşmak, sosyalleşmek  
**Geşbûn:** Şen olmak  
**Gewherfiroş:** Kuyumcu

**Girîng:** Mühim, önemli  
**Hacet:** İhtiyaç, alet  
**Hakeza:** Aynı şekilde  
**Helbest:** Şiir  
**Hengav:** An, adım  
**Heqdapaçandin:** Hakkı  
örbas etmek  
**Heqşînasî:** Hakkı tanıma,  
hakkı kabul etme  
**Hevnijad:** Soydaş  
**Hevpar:** Ortak, müşterek  
**Hevtone:** Yeknesak  
**Hêl:** Yan, taraf  
**Hilo:** Kalk, fırla  
**Hinartin:** Göndermek  
**Hind mêwî:** Hint kökenli  
**Hozayetî:** Toplumsal  
**Îbretamîz:** İbret verici  
**Karewan:** Kervan  
**Karpêk:** Eser  
**Kax:** Ekili arazideki yabancı  
otlar  
**Keştî:** Gemi  
**Kewandin:** Dağlamak  
**Kêfxweş:** Şen, mutlu  
**Kîja:** Hangi  
**Komele:** Toplum, cemiyet  
**Ji rêzê:** Sıradan  
**Jîn:** Kadın  
**Jîn:** Hayat  
**Leşkerî:** Askeri  
**Lihevanîn:** Uydurma,  
uyumlu hale getirmek  
**Lorîn:** Ninni  
**Los:** Hile, desise  
**Mer'iyet:** Yürürlük, yürür-  
lükte olmak  
**Mirovnasî:** İnsanbilim, an-  
tropoloji  
**Mîheng:** Ölçü, esas  
**Naverok:** İçindekiler  
**Naxwe:** Öyleyse, o halde  
**Nemaze:** Bilhassa  
**Netewe:** Ulus, halk  
**Newal:** Vadi  
**Nijad:** Irk, soy  
**Nîr:** Boyunduruk  
**Nûjen:** Modern, çağdaş  
**Palpişt:** Dayanak  
**Pare:** Parça  
**Pejirandin:** Kabul etmek,  
tercih etmek  
**Perpitîn:** Çırpınma

**Pêvajo:** Süreç  
**Pêwîst:** Lazım, gerekli  
**Pirtûk:** Kitap  
**Pola:** Çelik  
**Qad:** Meydan, yer  
**Qaj:** Karga  
**Qedîm:** Önce, eski  
**Qonax:** Köşk, konak  
**Ragihandin:** İletişim, ko-  
minikasyon  
**Rayda:** Etkili, müessir  
**Rewş:** Metod, stil  
**Ronakbîr:** Aydın  
**Sengandin:** Tartmak, de-  
ğerlendirmek  
**Serfiraz:** Başarılı  
**Sernûçe:** Manşet  
**Sazgeh:** Kurum  
**Sazûman:** Düzen  
**Sedem:** Sebep, neden  
**Serencam:** Sonuç  
**Sererast:** Doğru, yerinde  
**Sernivîsar:** Başyazı  
**Serwer:** Egemen  
**Sorgul:** Kırmızı gül  
**Şahnaz:** İftihar, övünç  
**Şamîl:** Kapsayıcı  
**Şano:** Sahne, tiyatro sahne-  
si  
**Şareza:** Aydın, bilgin  
**Şîn:** Ağıt  
**Şoresvan:** İnkılapçı, savaş-  
çı  
**Tengezarî:** Tedirginlik, sı-  
kıntı  
**Teral:** Tembel  
**Tevger:** Hareket, eylem  
**Tewr:** ...o kadar ki  
**Têkilî:** Karışmak, müdahale  
etmek  
**Tîp:** Harf  
**Tore:** Töre  
**Uryan:** Çıplak  
**Wargeh:** Kilik, parti  
**Wengerandin:** Çevirmek,  
tercüme etmek  
**Weşan:** Yayın  
**Xarpût:** Harput  
**Xemgînî:** Endişe, burukluk,  
sıkıntı  
**Yekem:** Birinci  
**Zar:** Lehçe  
**Zevî:** Ekili arazi

**ÇEPERAST**

1- Sala 1903'an de li Kurdistana Êraqê li Barzan hatiye dinyayê. 2 Sibata 1979 li Amrîqayê wefat kir. Heyata wî ji bo rizgariya gelê Kurd di têkoşînên çekdarî û siyasî de derbas bû. Sala 1946 de, di cumhûriyeta Mehabada Kurdistanê de wezîrê parêziyê bû. Piştî cumhûriyeta Mehabadê sala 1948'an de hilşiya çû nav Êris. Piştî deh sala 1958 de vegeheriya Kurdistana Êraqê. Heta dawiya temenê xwe, geh bi şerê çekdarî, geh jî bi xebatên siyasî ji bo rizgariya Kurdan xebitî. (Resmê di navê de) - Cihê ku genim dibe arvan 2- (Berepaş) Di muzîkê de notayek - Bavê însaniyetê - Bi Erebî av 3- Hêşinatî, - Pispor, kesê ku têgehîştîyê tiştêkê, hoste 4- Wicûd, gihan - Hêz, qam, ji bo taqet û quwetê tete gotin 5- (Berepaş) Endam - Diranê sa 6- Rehmet 7- Bi Tirkî dest - Kelk, ser xênî, piştî xênî 8- Beyreq 9- Sênî, berkeş - Avdestxane, destavxane 10- (Berepaş) Sîng - Bi Tirkî zaferan, zefran 11- Hestiyek, caw - (Berepaş) hejmarek - (Berepaş) De 12- (Berepaş) Çadir - (Berepaş) Bager



**SEREJÊR**

1- Dewleta Boşnakan ya ku ji aliyê Sirban hatiye îşxalkirin 2- Dapîtin, kesaxtin, çipilandin - (Berepaş) Ecele, zû - Rik 3- (Berepaş) Dil - (Berepaş) avahî, xanî 4- Dimilî, dinbilî - Şeytan 5- Navê qewmê Hezretî Lût - (Berepaş) Dîn 6- Hejmarek - xezal 7- Bawerî, yeqînî - (Berepaş) lebateke mirov 8- Vît, erwaz, tîk - Di zivistanê de dibare 9- Navê parzemînek - (Berepaş) Rojên çûyî 10- Dafeke teyr û balinde ya ku mirov pê teyr û balinde digre - irq, reh, regez

**BERSIVA RÊZEPİRSA HEJMARÊ 7.**

**ÇEPERAST:** 1- Şêx Seîd-To. 2- Ar-Ewd-Kel. 3- Fiş-Lemec. 4- Îşaret-Ram. 5- Pê-Ahû. 6- Hen. 7- Re-Afî. 8- Êreb. 9- Sile-Em. 10- Kirfîv-Par. 11- Cînar. 12- Pace-Nogin.  
**SEREJÊR:** 1- Şafît-Rîz-Ab. 2- Êriş-Herik. 3- Şape-Êlinc. 4- Se-Rêncber. 5- Ewle-Îc. 6- Îdet-Evîn. 7- No. 8- Keramat-Pag. 9- Tecah - Qari. 10- Ol - Mûsil.

*Amadekar:* **ELÎ KEÇELÎ**

**KARTA ABONETIYÊ**

Ji kerema xwe ve ji hejmara [.....] pê ve min bikin aboneya/aboneyê kovara *nûbihar*.

**Nav û paşnav:**

**Navnîşan:**

**Jimareyên hesabê ji bona razandina bedela abonetiye:**

**Li hundur:** Postgiro (Posta Çeki): Süleyman Çevik, 658265

**Li derve:** Süleyman Çevik, İş Bankası Yavuzselim Şubesi, 1079 - 30100 - 3118770

Ji kerema xwe ve, Karta Abonetiye dagirin û tevli kopyeke pela razandina bedela abonetiye bişinin navnîşana me.

**Navnîşan:**

Kızıtaşı Cad. Kuriş Apt. No: 51/3 Fatih - İstanbul Tel/Faks: 524 00 38 - 533 75 88

**Bedela abonetiye:**

**Li hundur:** 120.000 TL. **Li derve:** 50 DM.

# KOVARA İSLAMÎ YA KURDÎ (KÛRTÇE İSLAMÎ DERGİ)

## nûbihar

Mehnameya Çand û Huner û Edebiyat  
(Aylık Kültür Sanat Edebiyat Dergisi)

**KOVARA NÛBIHAR**

**EWILÎN KOVARA İSLAMÎ YA KURDÎ YE.**

**BIXWÎN, BIDE XWENDIN Û JÊ RE**

**ABONEYAN PEYDA BIKE. EV,**

**MESÛLIYETA TE YA İSLAMÎ Û İNSANÎ YE.**

(NÛBIHAR DERGİSİ

İLK KÛRTÇE İSLAMÎ DERGİDİR.

OKU, OKUT VE ABONELER BUL. BU,

SENİN İSLAMÎ VE İNSANÎ GÖREVİNDİR.)

## **weşanên nûbihar** (**nûbihar yayınları**)

**Rîsala Biratiyê / Seîd ê Norsî**

**Rîsala Biratiyê (Bi herfên Erebî)**

**Peyivên Piçûk / Seîd ê Norsî**

**Peyiva Bîst û Seyemîn / S. Norsî**

**Şırnak Baskını / Osman Resulan**

**Bediuzzaman'ın Hayatı / Abdurrahman Nursî**

**Di xwestinê we yên tevayî de, kitêbên Kurdî bi 30 %  
û kitêbên Tirkî bi 40 % erzanî tèn şandin.**

(Toplu isteklerinizde Kürtçe kitaplarımız % 30,  
Türkçe kitaplarımız % 40 indirimle gönderilir.)

**Navnîşan (Adres)**

Kıztaşı Cad. Kuriş Apt. No: 51/3, Fatih/İstanbul

Tel/ Faks: 533 75 88 - 524 00 38

